

## Erdnîgarî qeder e?

Dema min dît ku li metropolên Tirkiyeyê gelek kurd ji ber metirsiya faşîstan, an jî ji ber hin sedemên aborî plakayên siwareyên xwe yên bi hejmarên bajarên kurdan diqulibînin ser hejmara bajarên ku lê dijîn... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Li Omeriyan

Îja em ên ku bi nav salan de çûne hebekî bi eks in, me bela xwe di ruhstîn jî daye, zû bi zû ruhê xwe radest nakin. Em di qatê çaran de li jûrekê ne ku li zinara Mêrdînê dinêre. Em her du, xweşiya jûrê jî... ***Feratê Dengizî / R.5***



## Em Zapatîsta ne

Em Zapatîsta ne, em li vê derê ne. Ji bo ku em werin dîtin, em rûyê xwe vedişêrin; ji bo em werin binavkirin, em navên xwe diguherin; em ji dema niha bawer in, ji bo ku pêşerojeke me hebe û ji bo ku em bijîn, em dimirin... ***Sozdar Koçer / R.7***


# xwebûn

12 -18 TÎRMEH 2021 HEJMAR: 82 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Li dijî kurdan şerê avê

DEDAŞ'ê di rojên dawî de li Êlih, Şirnex û Mêrdînê ceyran ji ser bîrên avê qut kir û gelek gund bê av hiştin. Dîsa hikûmeta Tirkiyeyê ava Çemê Firatê ji ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qut dike û welatiyan bi avê terbiye dikin. Hikûmeta Tirkiyeyê bi qutkirina avê hewl dide li Bakur û Rojavayê Kurdistanê koçberiyê pêş bixe û demografiya herêmê biguherîne. Gelê bakur nerazîbûn û bertekên xwe tînin ziman û vê yekê qebûl nakin... ***R.3-6***




## Malbata Şenyaşar 4 meh in têdikoşe

Li navçeya Pirsûs a Rihayê beriya hilbijartinên 24'ê hezîranê di 14 hezîranê de, komek AKP'î ku ji parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz û mirovên xwe pêk dihat, êrîşî endamên malbatê kiribûn. Di êrîşê de Haci Esvet Şenyaşar û kurên wî Adîl û Celal Şenyaşar hatibûn kuştin. Di ser bûyerê re 4 sal derbas bûn. Di danişîna dawî ya 2'yê nîsanê de 37 sal û 9 meh cezayê girtîgehê lî Fadil Şenyaşar hat birîn. Birayê parlamenterê AKP'ê Enver Yildiz jî bi 18 sal an hat cezakirin. Dayik Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar zêdetirî 4 meh in, li ber deriyê Edliyeya Rihayê nobeta edaletê berdewam dike. Emîne û kurê xwe niha li ber germa havînê û tevî gelek caran hat binçavkirin bi biryar û israr çalakî û têkoşîneke xwe berdewam dike. Ji bo ku doz bi encam nebe û sûcdar neyên cezakirin 8 caran dozger hat guhertin... ***R.3***



## 14'ê Tîrmehê berxwedaneke hevpar bû

Zindana Amedê, li aliyekî cihê îşkence, înkar, heqaret û lêdanê bû. Li aliyê din cihê berxwedan, biryar, sekn û têkoşînê bû. Li aliyekî nûnerên dewletê, li aliyê din jî nûnerên gel hebûn. Her ku nûnerên dewletê rêjeya îşkence û neheqiyê zêde kirin, girtiyên siyasî jî ew qas bêtir li ber xwe dan. Herî dawî li dijî vê îşkenceya giran di 14'ê Tîrmehê de biryar dan ku êdî dest bi rojiya mirinê bikin. Hêza berxwedana girtiyên 14'ê Tîrmehê ji mafdariya wan bû. Parêzer Kazim Bayraktar ê ku parêzeriya Kemal Pîr û Mehmet Hayrî Dûrmûş dikir, qala rojên zindana Amedê yên sala 1982'an kir. Bayraktar, destnîşan kir ku Zindana Amedê dişibiya Kampa Naziyan. Îro jî li dehan girtîgehan girtiyên siyasî nêzî 230 roj in li dijî tecrîdê di greva birçîbûnê de ne ... ***R.6***

ADAR ŞAMAN

## Jin bi eşqa statûya xwe rabûn... *R.2*

## HDP li qadan e

HDP'ê di civîna Lijneya Rêveberiya Navendî (MYK) û Meclîsa Partiyê (PM) de ku piştî doza girtina partiyê li dar xist biryar girt ku dakeve qadan. Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Bûldan û Mîthat Sancar wê di çarçoveya "Kampanyaya Parastina HDP'ê" de, li 7 bajaran mîting û hevdîtinên gel pêk bînin. Starta hevdîtina ku hevserokên giştî ji du baskan ve dan destpêkirin li bajarê Îzmîrê ku Denîz Poyraz lê hatibû qetilkirin bi mîtîngê dest pê kir... ***R.3***



## Bi dizî hînî tîpên kurdî dibûn

Mamosteya zimanê kurdî Gulê Hesen têkildarî xebatên ziman yên li Rojava ji rojnameya me re axivî. Hesen got ku salên borî bi dizî hînî kurdî dibû, lê niha dersên kurdî dide... ***Hevpeyvîna Evîn Hesen / R.4***

## 'Bi lez kongreyeke neteweyî divê'

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê- Rojava li Qamişlo komxebetek bi boneya yekitiya neteweyî li dar xistin. Der barê komxebata KNK'ê de Ekrem Berekat axivî. Komxebata ku ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê-Rojava ve hate birêxistinkirin, piraniya partiyên kurdî yên li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, rêxistinên civakî, sivîl, rêxistinên jinan û rêxistinên ciwanan beşdar bûn. Komxebata ku bi dirûşmeya 'Bi yekitiya neteweyî em ê dagirkeriyê têk bibin û rê li şerê navxweyî bigirin' dest pê kir ji du beşên sereke hat birêxistinkirin. A yekemîn xeteriyên Tirkiyeyê ya li ser Kurdistanê bû. Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê (PDKS) Cemal Şêx Baqî û endama rêveberiya desteya rêveber a KNK-Rojava... ***R.7***

## Vera kaosê rojeve

Nê rojan rojeve de zaf çîyê ke ganê merdimî bidejnê estê. Merdim reaksîyonan ver nêreseno. Hetêk ra binpaykerdişê heqê tepişteyan, hetêk ra wedaritişê Pêkerdişê Stenbolî hetêk bîn ra krîzê ekonomî û ver bi ziwatîyê îklîmî. Gelo ma do senî bieşkê nê welatî de wina bi asanî helm bigîrê û bidê. Ma senî eşkenê çimê xo nê çîyan ra padê? Eke merdim xo ra vajo, "ez însan a" mimkin nêyo ke vera nînan de bêreaksîyon û bêhîs vindero..Her çiqas medyaya Tirkan de grevê vêşanîye ca nêgîro yan zî iqtîdar nêkero rojeve xo zî la nika zîndanan de bi hezaran tepişteyî hemverê tecrîdî û binpaykerdişê... ***Gulçîn Adar /R.9***

## Destarê dest bi gerandinê kir

Kovara wêjeyî ya Destar, a ku bi angaşta ekoleke nû ya wêjeyî derketiye rê dest bi weşana xwe kir. Demeke dirêj bû amadekariyên kovara ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve dihatin kirin. Kovara ku dê her 3 mehan carekê bê weşandin bi hejmara xwe ya yekemîn a hezîran, tîrmeh û tebaxê gihişt ber destê kurdîhez û wêjehezan. Kovara Destar bi dirûşmeya xwe ya bingehîn 'Destarê kurdî hûr dihêre' bi tîpên latînî, bi zaravayên kurmancî, kirmanckî û soranî weşanê dike. Lê hewldana kovarê ew e ku di hejmarên din de cih bide zaravayên kurdî yên din jî... ***R.11***

## Li Botanê çanda pale û zibareyê

Ji nav erdên bê ser û ber rengekî zer dibiriqe. Tîna rojê di rayên simbilekê de tev digere û roj tê li ser sifreya welatiyan dibe nanê tenûrê an jî xwarinên cur bi cur... Simbilên genim ên çend demsalan ji axa welêt hildiberin, bi serbilindiyekê li benda paleyan in, li benda dengbêjiyê û li benda keda Kurdistaniyan in. Ji demsalan havîn e û ji nav rengên welat li herêma Şirnex dem dema pale û zibareyan e.Li xwezaya her welatekî berhemên cur bi cur şîn dibin, li her welatekî bi rengekî cuda dibişire xwezaya dewlemend. Ji ber vê yekê ye ku li her welatekî fêkî û nebatên cuda hene... ***Serdar Altan / R.12***

# Jin bi eşqa statûya xwe rabûn

Jin, bi eşqa statûya xwe rabûn serhildanê. Lewma bêçaretî koletî ye. Jinên zana dikarin xwe bi awayê baş di nav civakê de biparêzin. Ramyarî, zanyarî û wêrekbûn bi ruhê têkoşerî ava dibe. Pêwistî bi avakirina pergala civaka jinan heye. Êdî dem dema parastina jin û civaka azad e



Adar Şaman

Fesihkirin, rakirina ji meriyetê ya Peymana Stenbolê, di asta cîhanî de jinan li dijî rejîmên totalîter, mîlîtarîst, 'femînîstî,' rabûne serhildanê; hêz û ezmûna têkoşîna xwe gihandin hev. Di serî de li Tirkiyeyê, bakurê Kurdistanê û gelek welatên cîhanê di pêşengiya jinan de xwepêşandanên girseyî pêş ketin. Kuçe-kolanên cîhanê veguherîn rengê serhildana jinan. Jinan, di berxwedana 1'ê tîrmehê de tenê biryara parastina destkeftiyan nedan; hêza mezinkirina qadên azadiyê nîşanî rejîma destpot dan.

Hêrsa jinan tu astengî nas nekir; roja 1'ê tîrmehê bû roja têkoşînê ya jinên cîhanê. Jinan di vê meşa xwe ya di asta dinyayê de, biryara ji bo hevpeymaneke global a têkoşîna hevpar a jinên cîhanê dan. Jin, bi yek helwestê li ber zilma dewlet-desthilatdariyê bûne yek. Vê hêza jinan a yekgirtî li pêş xwe tu sînor nas nekir. Civaka jinan ku hêza xwe yek bike, wê di mijara pirsgirêkên jin û civakî de bi awayek têkûzkirî, rêxistinî bi peywira xwe ya guhertin û veguhertina mêr rabe. Di serhildana jinan a 1'ê tîrmêhê de aşkera diyar bû ku hêza jinan a têkoşîna di asta cîhanî de bike, heye. Jinan, bi yek helwestê biryara têkoşîna azadiyê dane rejima tirk. Jinên daketin qadan peyama tifaqa têkoşînek yekbûyî dane rejimên dijber ên civaka jinan.

**Wêrektî û israra azadiyê**

1'ê tîrmehê ji bo jinan, bû hinceta hêza xwebirêxistinkirinê û destpêkeke nû. Êdî jin bi têkoşîna xwe yên dijî kedxwarî, koletî, li bajar, çiyayan, nava malê, kargeh, kolanan, li tevahî qadên ku newekhevî, bêdadî û tundûtûjî lê heye, têdikoşin. Hestên rêxistinkirî, meriv ber bi lêgerîna azadiyê û kaş dikin. Kesê/a xwe bi rêxistin, rêk û pêk dike, ew kesên ku xwedî xeyalên mezin ên lêgerîna azadiyê ne. Jinên bi rêxistinkirî, xwedî hêza parastina xwe ne. Ji bo vê jî pêwîstî bi zanebûn, wêrekî û israra di azadiyê de heye.

Dîroka Peymana Stenbolê, her çendî xwe bispêrê 2011'an jî ku dewleta tirk yekem car peymanek di asta hiqûqî ya navneteweyî de destnîşan kiribû, di 20'ê adara 2021'ê de bi destnîşana zilamekî ev peyman hatibû fesihkirin. Lê ya rastî Peymana Stenbolê encama berdelên giranbiha, ked û têkoşîna jinan e.

**Divê qad tu carî vala nemînin**

Her wiha ew zîhniyeta ku Denîz Poyraz qetil kir; ya ku bi destnîşanekî dest di Peymana Stenbolê de werda û fesih kir heman zîhniyet e. Rejîma tirk a ku qaşo vêga dasthilat e: mafên jinan ên hiqûqî, siyasî û qanûnî yek bi yek bi hincetên bêbingeh ji holê rakirin. Yek ji wan mafên hiqûqî jî Peymana Stenbolê bû. Rejîma AKP-MHP'ê di her fersendê de her ku devê xwe vedikin, li şûna gotinan, xwîn ji devê wan dibarê û êrîşî destkeftiyên gelê kurd, nirxên jinan dikin. Ji ber ku Denîz Poyraz, jineke kurd bû, têkoşer û zaroka malbatek welatperwer-kurdperwer bû, hat hedefgirtin. Bi qetilkirina Denîz re nasnameya jinên têkoşer û sekna kurdên azad hat armanckirin. Dayika Denîz, Fehîma Poyraz bi helwesta xwe ya wêrek û rûmet planên şerê taybet-psîkolojîk ê li ser ciwanên kurd tê ferzkirin pûç kir. Dayika Fehîma, jineke serfiraz û xwedî çandek kûr a welatperweriyê ye. Ya rastî sekna dayik Fehîma Poyraz ji bo her kesî bû mînaka hêzê. Û pêwîst e kurd vê helwesta wê ji bo xwe esas bigirin. Dê ev sekin û helwest, gelê kurd bigihîne serkeftin ê. Dayik Fehîma, di wê kelegerma dilşewitî de, şêwazeke pir zana û xwînsar raber kir. Tavilê ji kujerê Denîzê, Onur Gencer ê ku plankirî Denîzê kuşt hesap pirsî û banga xwedî derketina li têkoşîna Denîz kir.



Heya ku hevpeymaneke wekheviya zayendî û civakî pêk bê, pêwîst e jin, ji qadên çalakî û têkoşînê venekişin. Divê qad ji çalakiyên jinan tu caran vala nemînin. Pêdivî bi peymaneke civakî ya nû heye. Li hemberî pergala ku ji her hêlê ve destkeftiyên jinan dixe hedef, pêwîstî bi her awayî têkoşîneke bîrdoziyê heye. Loma êrîşên ser nirxên jinan tên kirin di asta îdeolojîk, psikolojîk, fîzîkî û polîtîk de ne. Tevgera jinên kurd, di asta avakirina alternatîf, ezmûn û rêxistinî de xwedî daneheveke dîrokî ye. Rêxistin dema ku ser ezmûnên dîrokî bê avakirin, hîn çêker e.

**Hevpeymana civakî**

Tevger, sazî, komele û platformên civakî yên jinan, wê di encama nirxandin/ponijandin û lêhurbûnê de alternatîfên pergala jinan derxin holê. Dîroka têkoşîna jinan, bi cerebe û afirîneriyê tê nasîn. Jin, li çarenûsa xwe digerin. Jin, bi eşqa statûya xwe rabûn serhildanê. Lewma bê çaretî koletî ye. Jinên zana dikarin xwe bi awayê baş di nav civakê de biparêzin. Ramyarî, zanyarî û wêrekbûn bi ruhê têkoşeriyê ava dibe. Pêwîstî bi avakirina pergala civaka jinan heye. Êdî dem dema parastina jin û civaka azad e.

Pîvanên çarenûsa azadiya jinan, ji rêgezên têkoşîn, rêxistinî, welatparêzî, parastin, evîn, çanda azad û peymana civakî ya ku têkiliyên di navbera jin û mêr, jin û zarokan, jin û xwezayê, jin û jiyanê saz dike, pêk tê. Hevpeymana civakî, bi tekiliyên wekhev ên zayendî û jiyana azad pêş dikevin. Jin, di têkoşîna wekheviyê de '2 gavan' li pêş mêran in! Çarenûsa jinan, paşeroja jinên civaka azad e.



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Erdnîgarî qeder e?

Dema min dît ku li metropolên Tirkiyeyê gelek kurd ji ber metirsiya faşîstan, an jî ji ber hin sedemên aborî plakayên siwareyên xwe yên bi hejmarên bajarên kurdan diqulibînin ser hejmara bajarên ku lê dijîn, gotina 'erdnîgarî qeder e' hatibû bîra min. Ev kes ji ber hin sedeman ji qedera xwe direviyan, an jî dixwestin qedera xwe veşêrin. Her çiqas ev yek girêdayî gelek faktorên din be jî di navbera ax, cihê ku mirov lê tê dinê û qedera mirovan de têkiliyeke yekser heye. Bêguman erdnîgarî, ax bi xwe sedema bêqederî –bi giranî di wateya neyinî de nîn e; lê li welateke bindest û dagirkeriyê jiyîn an jî ji wir bûyîn, vê yekê hîn xuyatir dike. Her wiha gotinên wek 'bi qedera xwe razîbûn' an jî 'li dijî qedera xwe derketin' gotinên girêdayî bindestbûn û feqîriyê tên bikaranîn. Ger qeder ji bo her mirovî derbasdar be, gelo em çima ji devê kesên dewlemend 'qedera min ev bûye' nabihîzin lê yên bêbext her bi vî awayî xwe aş dikin?

Di pergala mêtîngêriyê de yên serdest civaka ku desteser dikin li ser esasa cudabûnê pênase dikin. Ango yên 'ne wekî te', 'yên din' in. Û ev yek bi giştî li ser biçûkdîtina yên din dimeşe. Di hemû pêvajoyên kolonyalîst de yên dagirker û mêtînger îdîaya 'em pêşketî ne' dikin. Ligel vê yên din 'yên paşdemayî' ne û divê bên perwerdekirin, şarezakirin û bikevin bin xizmeta efendiyên xwe. Hemû polîtîkayên mêtîngeriyê li ser vê darazê tê meşandin. Wek mînak welatên ewropî û amerîkî li koloniyên xwe yên Afrîka, Amerîka û Asyayê bi vê hişmendiyê tevgeriyan. Mîsyonerî li ser vê esasê pêş ket. Yek ji van polîtîkayên wan ên bingehîn jî 'dibistanên koloniyan' bûn. Heta ev nav bi awayekî fermî li van dibistanan hatibû kirin û armanca wan a yekemîn ji bo dewletên kolonyalîst memûr perwerdekirin bû. Ev polîtîka tev li hin encamên bi sosrettir û dijî mirovahiyê li Kurdistanê jî hat pêşxistin. Girêdayî pergala wan a perwerdeyê kurd paşdemayî, nezan, heta ne kurd û ne mirov bûn. Lênêrîna vê mijarê hinek cudabûna pêvajoyên 'postkolonyal' û 'dekolonyal' jî dide der. Wek mînak Îngilistan ji ber ku ji koloniyên xwe sûdê werdigirt, ango pêdiviya wî bi dewlemendiyên wan ên bin erdê û ser erdê hebû, perwerdeya xwe ya kolonyalîst li ser esasa 'xizmetkariya Îngilistanê' dimeşand. Walî û mamosteyên koloniyan heta ji dest dihat, welat û kesên ku hatine dagirkirin, dixistin bin xizmeta Îngilistanê. Îngilistan ji xwe re muxatabên bindest ava dikir. Ev yek jî hiştî ku her tim di navbera serdest û koloniyên wî de têkiliyeke li ser (ne-) parvekirina hêzê heye. Di pêvajoyên postkolonyal de yên bindest daxwaza dewlemendiyên/hêzên xwe yên hatine dizîn dikin. Lê di pêvajoya dekolonyal de têkilî li ser esasa daxwazkirina diziya dewlemendiyên koloniyan nameşe; lewre li van deveran mêtîngerî li ser tunekirina hemû hebûna koloniyan dimeşe. Axa wan, ava wan, mirovên wan, zimanên wan, çanda wan, hêza wan û hwd. her tişt tên talankirin, tunehesibandin û tunekirin, yên tên mêtîngêrkirin muxatab nayên girtin, bi rêya qeyûman berdevkên xwe li ser wan ferz dikin. Dagirker wisa dike ku tu ji xwe, ji hebûna xwe, navê xwe, çanda xwe şerm dikî, dixwazî jê birevî. Hişmendiya kolonyalîzma Amerikayê li ser xwecihiyên bingehîn ên Amerikayê bi vî awayî bû. Polîtîkaya Tirkiyeyê ya li Kurdistanê jî bi vî awayî ye. Lewma li Kurdistanê tekoşînên li dijî mêtîngerî û nijadperestiyê dekolonyal in, an jî divê dekolonyal bin; ji ber ku xwe jinûveavakirin, hebûn û xwebûna xwe îspat kirin, qedera xwe ji nû ve nivîsîn pêvajoyên dekolonyal in.

Çîrok an jî têkoşîna Merveyê ya lîstîkvana hentbolê mînakeke ji pêvajoya dekolonyal e. Dewleta dagirker a tirk bi polîtîkayên xwe yên mêtînger ên li Kurdistanê ne tenê bi rêya bişaftinê tunekirina çand û zimanê kurdan kir hedef, di heman demê de li heremê li beramberî nijadperestiyê, baviksalarî û paşverûtiyê bi rê ve bir. Armancên kampanyayên wek 'bavo min bişîne dibistanê' an jî 'ez û dayika xwe bi hev re diçin dibistanê', ji hêlekê de tunekirina zimanê kurdî bû, lê li hêla din tunekirina mirateyên xweser ên civakî ku bi taybetî bi rêya jin û keçikan digihişt nifşên din, bû. Her çiqas ev dibistan wek amûrên şaristaniyê bên dîtin jî, dagirkerên wek Tirkiye di polîtîkayên perwerdehiyê yên kolonyal de tu carî pêşketina xwendeyan nakin hedef. Armanc xizmetkar an jî memûr perwerdekirin jî nîn e; armanca bingehîn tunekirina hebûn û nirxên civaka xwecihî ye. Merve di axaftina xwe de behsa mamosteyên xwe yên ku jê re dibêjin, 'tu keç î, şerm e, nikarî şort li xwe bikî û bi lawikan re bilîzî' dike. Heta duh digotin çanda baviksalar a kurdan nahêle ku keç bixwînin û biçin dibistanan. Niha ev mînak nîşan dide ku çawa baviksalarî û zihniyeta mêtînger de xwe saz kiriye. Paşverûtiya ku di nav malbat û civakê de heye jî yek ji encamên van polîtîkayên mêtînger in. Hem paşverûtî û hem jî baviksalarî amûrên sazîkirî yên dewletê ne û wan li gorî berjewendiyên xwe wek çekê bi kar tîne.

Bêguman di nav civaka kurd de hem paşverûtî, hem baviksalarî û hem jî dijminatiya li hemberî jinan heye. Lê ev nayê wê wateyê ku civaka kurd bi xwe xwedî van taybemendiyan e. Ev hemû taybetmediyên baviksalarî û dewletî ne. Lewre dewlet saziya herî payebilind a baviksalariyê ye. Têkoşîna li dijî paşverûtî û baviksalariyê têkoşîneke dekolonyal e û divê li hemberî qedera ji aliyê dagirkeran ve hatiye nivîsîn, bisekine.




# Malbata Şenyaşar 4 meh in têdikoşe

Navenda Nûçeyan

Emîne Şenyaşar û kurê xwe Ferîd Şenyaşar, 4 meh in ji bo edalet pêk bê û hesab ji kujerên hevjîn û 2 zarokên wê bê pirsîn, li ber Edliyeya Rihayê bi israr û biryar nobeta edaletê digirin

Li navçeya Pirsûs a Rihayê beriya hilbijartinên 24'ê hezîranê di 14 hezîranê de, komek AKP'î ku ji parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz û mirovên xwe pêk dihat, êrîşî endamên malbatê kiribûn. Di êrîşê de Haci Esvet Şenyaşar û kurên wî Adîl û Celal Şenyaşar hatibûn kuştin.

Di ser bûyerê re 3 sal derbas bûn. Di danişîna dawî ya 2'yê nîsanê de 37 sal û 9 meh cezayê girtîgehê li Fadil Şenyaşar hat birîn. Birayê parlamenterê AKP'ê Enver Yildiz jî bi 18 salan hat cezakirin. Dayik Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar zêdetirî 4 meh in, li ber deriyê Edliyeya Rihayê nobeta edaletê berdewam dike. Emîne û kurê xwe niha li ber germa havînê û tevî gelek caran hat binçavkirin jî bi biryar û israr çalakî û têkoşîneke xwe berdewam dike.

Malbata Şenyaşar di 9'ê adarê de li ber Edliyeya Rihayê dest bi çalakiya runiştinê kir. Ji destpêka çalakiya rûniştina edaletê ya malbata Şenyaşar û heta niha Dayikên Aştiyê, TJA, KCD, HDP, DBP, Baro, ÎHD jî di navde gelek kes, rêxistinên jinan, sazî, partî û parlamenteran serdana malbatê kirin. Malbata Şenyaşar jî di çarçoveya 'Nobeta Edaletê' de li Enqereyê, Amedê û gelek cihên din bi partî û rêxistinên civakî re hevdîtin kir. Dayik Emîne û kurê wê di vê pêvajoyê de gelek caran hatin binçavkirin, lê dîsa dest ji çalakiya xwe bernedan.

Ji bo ku doz bi encam nebe û sûcdar neyên cezakirin 8 caran dozger hat guhertin û niha dozgerê 9'emîn hatiye erkdarkirin. Malbata Şenyaşar di çarçoveya nobeta "edaletê" de di roja 116'emîn a çalakiyê de çû Amedê û serdana Partiya DEVA'yê û Baroya Amedê kir.

**"Edî bes e'**

Emîne Şenyaşar di serdana Baroya Amedê de got: "Em bi parçeyek kaxez li edaletê digerin. Xwîna zarokên min li nexweşxaneyê bû. Min hemû dît. Em edaletê dixwazin, êdî bes e ji vê zilmê re."

Serokê Baroya Amedê Nahît Eren jî bi bîr xist ku ew doza malbatê ji nêz ve dişopînin û ev tişt got: "Ev bûyer her kesî xemgîn dike. Em ê heta dawiyê şopdarê dozê bin. Em soz didin ku em ê li cem malbatê bin."

Çalakiya Malbata Şenyaşar di roja 126'an de berdewam dike. Herî dawî Berxwedêra Yukselê Merve Demîrel a ku bi KHK'ê ji kar hatibû avêtin tevî Fîlîz Ozçelîk a ku dayika wê Edîbe Ozçelîk li Samandaga Hatayê di serdegirtina malê de dilê wê sekinîbû, hat serdana malbatê kir. Dîsa Hewldana 78'an, Rêveberên Partiya Gelecek'ê jî serdana malbatê kirin. Ew qas sazî û rêxistin hatin piştgirî dan çalakiya Malbata Şenyaşar, lê Serokkomarê Tayîp Erdogan ê di 9'ê tîrmehê de hat Amedê, li şûna guh bide dengê Emîne Şenyaşar hat malbatên ber avahiya HDP'ê ziyaret kir û qêrîna Emîne Şenyaşar neanî xwe.

# Kurdan bê av dihêlin

Navenda Nûçeyan

Hikûmeta AKP-MHP'ê heta niha bi polîtîkayên xwe her tim xwestiye cotkar û rênçbaran bi birçîbûnê terbiye bike. Niha jî li gundên Êlih û Şirnexê ji ber ceyranê ji ser welatiyan qut dike, ava welatiyan jî qut dibe. Gundî vê wekî zilmekê dihesibînin



Her sal li bajarên Kurdistanê pirsgirêka av û ceyranê di rojevê de ye. Niha jî li gundên navçeya Hezo ya Êlihê û gundên navçeya Hezexê ya Şirnexê ceyran ji ser welatiyan tê qutkirin û ava welatiyan tê birîn.

Şîrketa Belavkirina Ceyranê ya Dîcleyê (DEDAŞ) ji 23'yê hezîranê ve ceyrana dînamoyên bîrên avê yên bajaroka Kaniya Hênê, gundê Zîlan, Selîvê, Kanîkê, Malê Gir, Hiskutê û Holê yên bi ser navçeya Hezoya Êlihê ve biriye. DEDAŞ'ê bi hinceta "deyn nehatiye razandin" ceyrana bîrên avê biriye. Piştî birîna ceyranê bi hezaran mirov li van gundan bê av mane. Gundî pêdiviya avê bi traktoran ji Çemê Batmanê û qanala avdaniyê ya DSÎ'yê û bîrên avê peyda dike. Ji ber vê ava qirêj li gundan rê li ber nexweşîyan jî vekiriye. Gundî diyar dikin ku ji ber ava qirêj zikêşî, serêşî û vereşînê dest pê kiriye.

**DEDAŞ'ê gundî deyndar kir**

Rayedarên DEDAŞ'ê îdia dikin ku milyonek û 882 hezar lîra "deyn"ê wan li gundiyan e. Rayedarên DEDAŞ'ê deynê ceyranê dikin hincet û gundiyan bê av dihêlin. DEDAŞ'ê bi sedema deyn nedaye 735 hezar lîre faîz daniye ser deyn. Tenê li gundê Zîlan 206 hezar lîre pereyê bingehîn e, bi faîza derengxistinê re ev deyn bûye 514 hezar lîre. Şêniyên gundê Zîlanê dibêjin serê her fatûreya malekê 110 hezar lîre hatiye nivîsandin û ew mal û milkên xwe hemû jî bifiroşin wê nikaribin vî deynî bidin. Gundî li hember vê rêwşê bi bertek in û tişta DEDAŞ'ê aniye serê wan wek zilm dibînin.

**Nikarin sewalan av bidin**

Şêniya gundê Zîlanê Xerîbşa Oğûz, destnîşan kir ku ji ber bêaviyê nikare bi rehetî serê zarokên xwe bişo û bi fikar e û wiha got: "Zarokên me emel bûne. Em nikarin sewalên xwe av bidin. Baxçeyên me bêav mane. DEDAŞ'ê jiyana me felç kiriye. Bila demildest dawî li vê bêberpirsiyariyê bînin. Bi hezaran mirov di germa vê havînê de bê av hatine hiştin. Êdî bes e."

**150 mal bê av in**

Gundê Hespistê yê navçeya Hezexê ya Şirnexê, ji 29'ê hezîranê ve bê av e. Qeyûmê Hezexê bi hinceta ku ava navçeyê kêm bûye ava vexwarinê ya gundiyan birî. Gundê ku 155 mal lê hene bê av in û ji ber vê nikarin heywanên xwe jî av bidin. Şêniya gund Halîme Tekîn, anî ziman ku ji ber av tune ye ew nikarin karekî bikin. Tekîn, diyar kir ku qutkirina ava vexwarinê nayê qebûlkirin û got: "Îro 5 roj in ava me hatiye birîn. Ji ber avê em zehmetiyê dikişînin. Sewalê me, darên me bê av mane. Ava me tune ye. Ma mirov ava gundekî qut dike? Destpêkê ava me ya dehlê birîn û pişt re jî hatin ava me ya vexwarinê qut kirin. Hin mal, bîrên wan hene. Lê yên weke me yê ku bîrên wan tune ne, wê çawa îdare bikin? Dewlet hatiye ava me biriye û gund bê av maye. Em bê av in. Sewalên min û darên min bê av in. Ava me berdin."

**6 sal in ceyran tune**

Li navçeya Heweng a Rihayê, 6 sal in ceyrana Kooperatîfa Avdaniyê ya Hewengê hatiye qutkirin. Ji ber vê yekê 15 hezar donim zevî nayê avdan. Di sala 2013'an de deynê wê yê ceyranê 430 hezar TL bû, lê ji ber ku nehat dayîn şîrketa ceyranê di sala 2015'an de ceyran qut kir. Di 2018'an de qanûna avdaniyê hat guherandin û dewletê tevî yekitiyên avdaniyê qeyûm tayinî DSÎ'yê kir, lê Kooperatîfa Avdaniyê ya Hewengê derî vê hat hiştin û tevî xebatkarên wê rêvebiriya wê hat fesihkirin. Bi vî awayî ji ber qutkirina ceyranê av nehat kişandin û cotkar bê av hatin hiştin. Herî dawî kooperatîf di çileya 2020'î de dewrî DSÎ'yê hat kirin, lê ji ber ku hê jî deynê wê yê ceyranê nehatiye dayîn, av nayê berdan.

Serokê Odeya Çandiniyê ya Hewengê Fûat Elmas, destnîşan kir ku gelek caran hewil dane ji bo tesîsa avdaniyê bê vekirin, lê bi ser neketine.

# Cotkarên titûnê li qadan in

Navenda Nûçeyan

Wezareta Çandinî û Daristanê, ji bo titûnfiroşan di 2'ê tîrmehê de qanûneke nû derxist. Li gorî vê qanûnê kesên ku "belgeya karbidestiyê" ji Wezareta Çandinî û Daristanê negirin, nikarin titûnê bifiroşin. Kesên bêyî "belgeya karbidestiyê" bazirganiyê bikin, dê ji 3 salan heya 6 salan ceza li wan bê birîn. Têkildarî mijarê di 30'ê hezîranê de Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ê Antalyayê Kemal Bulbul, çûbû serdana esnafên li Çarşiya Titûnfiroşan a li navenda Semsûrê ku ji ber vê qanûnê mexdûr dibin.

**Titunfiroş di çalakiyê de ne**

Ji 1'ê tîrmehê ve firoşkarên titûnê nikarin titûnê bifiroşin û karê wan li wan hatiye qedexekirin. Di 2'ê tîrmehê de cotkarên titûnê bertek nîşanî vê sepanê dan. Bi hezaran cotkarên titûnê li navçeya Çêlikan a Semsûrê û navenda wê û navçeya Doganşehîr a Meletiyê rê girtin û bertekên xwe anîn ziman.



**Li Kolikê çalakî**

Çalakiyên şermezarkirinê yên li dijî bazirganiya titûnê berfireh dibe. Piştî Meletî û Semsûrê di 3'ê tîrmehê de li navçeya Kolikê ya girêdayî Semsûrê bi hezaran hilberînerên titûnê hatin gelhev û qedexeya li dijî xwe şermezar kirin. Hilberîneran rêya bejahiyê ya Semsûr û Kolikê ji trafîkê re girtin. Hilberîneran di rêya ku girtin de bi dahol û zirneyê govend gerandin. Xebatên Waliyê Semsûrê Mahmût Çûhadar ên qanihkirinê yên li dijî çalakiyên şermezarkirinê tu encam negirtin.

**Çalakî didome**

Piştî Meletî û Semsûrê li Amedê jî hilberînerên titûnê, li dijî belgeya rayeyê ya ku hikûmetê ji bo firotina titûnê derxist dest bi çalakiyê kirin. Hilberînerên titûnê yên navçeyên Karaz û Licê, li ser rêya Amed û Çewligê hev kom bûn û dest bi çalakiyê kirin. Hilberîneran rêya di navbera Amed û Çewligê de bi barîqatan girtin. Li ser vê yekê wesayît di rê de li pey hev rêz bûn. Di çalakiyê de ku nêzî 40 hilberîner tev lê bûn komê dirûşmên "dest nede titûnê" berz kirin.

**Titûnfiroş hatin binçav kirin**

Bi hinceta ku titûnfiroş li dijî qedexeya bazirganiya titûnê li Semsûr û navçeyên wê tev li çalakiyên şermezarkirinê bûne, gelek ji wan hatin binçavkirin. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin, leşker û polîsan li navend û navçeyên bajêr bi ser malan de girtin û nêzî 50 kesan binçav kirine. Hat zanîn ku kesên hatine binçavkirin birine Miduriyeta Polîsan a Semsûrê û Fermandariya Cendermeyan a Bajêr.

# HDP dîsa li kolanan e

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) di civîna Lijneya Rêveberiya Navendî (MYK) û Meclîsa Partiyê (PM) de ku piştî doza girtina partiyê li dar xist biryar hat girt ku dakevin qadan.

Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Bûldan û Mîthat Sancar wê di çarçoveya "Kampanyaya Parastina HDP'ê" de wê li 7 bajaran mîtîng û hevdîtinên gel pêk bînin. Starta hevdîtina ku hevserokên giştî ji du baskan ve dan destpêkirin li bajarê Îzmîrê ku Denîz Poyraz lê hatibû qetilkirin bi mîtîngê dest pê kir.

Di rojeva mîtîng û hevdîtinan de zext û doza girtina li ser HDP'ê hatiye vekirin, Doza Kobanê, Komkujiya Îzmîrê, operasyonên Tirkiyeyê yên derveyî sînor, tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan, çalakiya greva birçîbûnê, êrîşên ser destkeftiyên jinan, talana xwezayê û desteserkirina mafan cih digirin. Hevserokên Giştî ji xeynî mîtîng û hevdîtinan bi dînamîkên bajêr re jî dicivin.

Her du hevserok jî tevlî mîtînga 8'ê tîrmehê ya li Îzmîrê pêk hat bûn. Di bernameyê de Pervîn Bûldan di 13'ê tîrmehê de li Dîlokê, di 14'ê tîrmehê de li Rihayê û di 26'ê tîrmehê de jî li Kocaeliyê beşdarî bernameyan bibe. Mîthat Sancar jî wê di 17'ê tîrmehê de li Aydinê, di 28'ê tîrmehê de li Agiriyê û di 29'ê tîrmehê de li Bedlîsê beşdarî bernameyan bibe.

Dîsa cîgirên hevserokên giştî yên partiyê, serokwekîlên komê û berdevka partiyê, dê li gelek bajar û navçeyan hevdîtinan bikin. Dê heta 29'ê tîrmehê li Qers, Erdexan, Îdir, Manîsa, Mûş, Amed, Çewlig, Cizîr, Colemêrg, Bedlîs, Edene, Osmaniye, Hatay, Bûrsa, Balikesîr, Erzîngan, Meletî û Semsûrê beşdarî bernameyan bibin. **AMED**

## EM HÊVÎ DIKIN KU KURDÎ BIBE ZIMANÊ JIYANÊ

# Em bi dizî hînî tîpên kurdî dibûn

■ Evîn Hesen

*Bi armanca naskirina rewşa zimanê kurdî ya li rojavayê Kurdistanê, rojnameya Xwebûnê ev pirs ji mamoste Gulê Hesen kirin.*

**Li Rojava xebatên li ser ziman di çi astî de ne?**

Xebatên ziman di asteke baş de ne. Ji bo her aliyekî, awayekî cuda yê fêrkirinê heye. Yanî li Rojavayê, mamoste hene, xwendekarên dibistan û zanîngehan hene û xwendekarên nav gel jî hene ku tenê dixwazin xwe fêrî xwendin û nivîsîna kurdî bikin.

Mamosteyên ku li dibistanan perwerde didin, her havîn ji hêla komîteya perwerdehiyê ya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve tên gihandin û ji hêla ziman ve tên xurtkirin. Piştî ku perwerdeya xwe diqedînin, li gorî nirxandinê, vesaziya wan li dibistanan çêdibe û xwendekaran perwerde dikin.

Xwendekarên zanîngehan jî du beş in. Beşek ji wan ku di dibistanên kurdî de fêr bûye, yekser derbasî sala xwe ya xwendinê dibe û beşek ji wan bi kurdî nizanin, demekê tên perwerdekirin û paşê derbasî sala xwendinê dibin.

Kesên ku ne di sazî, zanîngeh û deverên perwerdeyê de ne û dixwazin bi awayekî xweser xwe fêrî zimên bikin, cih û navendên tomarkirina navan hene. Navên xwe qeyd dikin, pişt re mamoste wan dabeşî çend koman dikin û li ser vî bingehî, ji hêla komîteya fêrkirina zimanan ve tên perwerdekirin.

Ji bilî ku pergaleke bi vî awayî tê birêvebirin, hin sazî û dezgehên mîna şaredarî, çand û huner, komîn, asayîş ... ji komîteya fêrkirina zimanan daxwaza mamosteyan dikin, li saziyên xwe saetekê ji xwe re vediqetînin û xwe fêrî xwendin û nivîsîna kurdî dikin.

**Niha pergaleke perwerdeyê li Rojava tê rûniştandin, ji seretayî heta zanîngehan bi zimanê kurdî perwerde tê kirin. Ev pêvajo çawa dimeşe? Gelo kêmasiyên zimanî yên kurdî di vî warî de peyda dibin an?**

Devoka kurdên Rojavayê Kurdistanê ya jiyanî kurmancî ye. Yanî her kes li mala xwe li kolana xwe bi kurmancî diaxive. Ev rewş, yek ji sedema geşbûna xebatên zimên yê li Rojavayê ye.

Xwendekarên kurd ji baxçeyê zarokan heta bi refa 3`yan materyalên wan kurmancî ne; bîrkarî, ziman, civak û jiyan, mûzîk, yanî li kêleka kurmancî, tu zimanên din nabin. Gava xwendekar dibin refa 4`an, yek ji zimanên cîran (erebî - suryanî) dibijêrin û di wê salê de mamoste wan fêrî wî zimanî dikin. Gava xwendekar dibin refa 5`an li kêleka zimanê cîran, fêrî zimanê ingilîzî dibin û bi vî awayî perwerde tê birêvebirin.

Hin kêmasî peyda dibin. Ew jî ev in; Di qonaxa seretayî de kêmasî hindik in lê di qonaxên amadeyî û zanîngehan de kêmasî peyda dibin. Nimûne di qonaxa amadeyî de çend beşên cihê hene; dibistanên pîşesazî, çandinî û yên huneran her wiha her du beşên amadeyî; zanistî û wêjeyî. Xwendekarên van dibistanan vê dawiyê fêrî kurmancî bûne, yanî gava ew seretayî bûn, perwerdeya erebî birine. Ji bilî ku di seretayî de bi erebî fêr dibûn, têgînên kurmancî yên ku di qonaxa amadeyî de bi kar tên giran in. Bi taybetî têgînên beşa zanistî û pîşesazî. Ev giranî dibe sedem ku xwendekar carinan di madeya materyala xwe de tênegihêje.

Zimanên mîna erebî û ingilîzî bi sedan salan e ku xebat li ser wan hatine kirin, li her derê tên dîtin; TV, internêt ... lê têgînên kurmancî hem nû ne hem jî ne li ber çavan e. Yanî hîn bi awayekî rasterast neketine jiyanê.

Beşek xwendekarên zanîngehan ji dibistanên kurmancî der diçin û beşek jî erebî xwendine û dixwazin di zanîngehên kurdî de xwendina xwe temam bikin. Xwendekarên ku bi kurdî nizanin, piştî ku diçin zanîngehê nû fêr dibin. Lê bi giştî pirsgirêka çavkaniyan dijîn. Gelek fakulteyên zanîngehê hene. Piraniya çavkaniyan bi zimanên erebî yan jî bi zimanê biyanî ne. Yanî çavkaniyên bi kurmancî pir hindik in. Heke hebin jî pir kêm in. Xwendekar li vir gelek pirsgirêkan dijî.



Her nîqaşa ku li ser ziman çêdibe, di xizmeta ziman û pêşketina ziman de ye. Zimanên ku nîqaş li ser wan nînin, zimanên mirî ne

**Di amadekirina bernameyên dersan de hûn rê û rêbazeke çawa didin pêşiya xwe?**

Rêbazek ji rêbazên pedagojiyê ew e ku divê xwendekar xwe beşek ji waneyê bibîne, yanî nabe ku wekî rêbazên klasîk yên berê mamoste 45 deqeyên tijî biaxive û xwendekar tenê guhdar bike. Yanî divê rê li ber xwendekar vebe ku pirsan bike, mînakan bibêje, nêrîna xwe bide.

Di dibistanên amadeyî de, xwendekar metodan pêşkêş dikin. Metodên xwendekaran yan bi awayekî komî yan bi awayekî kesî tên pêşkêşkirin.

**Ji ber ku li cihên kurmanc dijîn saziyeke giştî ya zimanî tune ye hê jî li ser rêziman û rastnivîsa kurmancî nîqaş tên kirin. Gelo Rojava dê çiqas bikaribe bibe bersiva van nîqaşan?**

Her nîqaşa ku li ser ziman çêdibe, di xizmeta ziman û pêşketina ziman de ye. Zimanên ku nîqaş li ser wan nînin, zimanên ku xwediyên wan mirî ne yan jî zimanên jibîrbûyî ne.

Ji kovara Hawarê û bi vir ve, standardeke kurmancî rûniştiye û êdî bi awayekî giştî lihevkirinek li ser rastnivîsa kurmancî heye lê dîsa jî hin mijarên ku ji nû ve bên nîqaşkirin hene. Ji bo Rojavayê jî jixwe nabe ku mirov wê wekî parçeyekî serbixwe bihesibîne. Berî Serxet û Binxet çêbibin, tiştekî navê wê ev Bakur e ev Rojava ye nebûn. Ji bo vê pêwîst e mirov hîn jî bi heman awayî li mijarê binêre û bi taybet di mijara zimên de.

Pêwîstiya kurmancî bi nîqaşan heye û ji bo ku ev yek di aliyê pratîkî de pêk were, pêwîst e komxebatên hevbeş ku hemû kurmancan bîne cem hev pêk werin û kurmanc ji bo zimanê xwe bigihêjin çareyekê. Wekî me di pirsa berê de jî zelal kir, pirsgirêka kurmancî ya di hêla jêder û çavkaniyên zanistî de heye û pêwîst e kesayet û dezgehên ku ji bo kurmancî dixebitin, destekê bidin.

**Gelo niha li Rojava, di mijara ziman de jî saziyeke ku dê bikaribe pêşengtî li hemû kurmancîaxêvan bike heye an na? Ku tune be jî gelo hêviyên we ji vê yekê çi ne?**

Ziman bi serê xwe zanistek e û şax û beşên zimên pir in. Hin kes û hin sazî hene ku bi dehan salan e serê xwe li ser kurmancî, ferhenga kurmancî, dîroka kurmancî êşandine. Ancex bi alîkariya van kesan û van saziyan xebatên zimên baştir bibin. Yanî derfetên Rojava yê niha baştir in û ji bo parçeyên din zemînek e.

**Tu niha li Rojava di nav karûbarên perwerdeyî û zimanî de cih digirî. Serpêhatiya te ya li vê qadê çawa dest pê kir?**

Ez wekî hemû kurdên Rojava li malê bi kurmancî diaxivîm û diçûm dibistanê min erebî dixwend. Gava em zarok bûn mamosteyên dihatin taxên me, zarok kom dikirin û tîpên kurmancî didan wan. Her cara ku em digihiştin hin tîpan, an mamosteyê me ji hêla dewletê ve dihat girtin, yan jî zor û zehmetiyek çêdibû ku perwerdeya me betal dibû. Bi saya wan mamosteyan, em fêrî tîpan bûn. Vê rewşê wilo dom kir heta ku çirûska şoreşê li Tûnisê vêket. Amadekariya şoreşa Sûriyeyê dihat kirin, di wê pêvajoyê de, dîsa hin mamoste hatin û kom ava kirin. Wan mamosteya em fêrî rastnivîs û rêzimana kurmancî kirin. Me rojinan xwe perwerde dikir û rojinan em diçûn û me perwerde dida. Bi şev û bi roj pirtûk ji destên me nediketin. Destpêkeke pir zehmet bû lê pir xweş bû.

**Gelo tu dikarî piçekî behsa pêvajoya veguherîna perwerdeyê ya piştî Şoreşa Rojava bikî?**

Perwerdeya berî şoreşê, bi zimanê erebî bû. Em fêrî çandeke cuda, zimanekî cuda, alfabeyeke cuda dibûn. Gotin û qalibên zimanê erebî bandoreke cidî li me û li mejiyê me dikir. Lê perwerdeya ku niha tê dayîn, cuda ye. Her zarokek bi zimanê dayika xwe perwerdeyê distîne; kurd bi kurdî, ereb bi erebî ... û li kêleka vê yekê kurd perwerdeya xwe bi zimanê xwe dibin û fêrî du zimanan dibin û ereb jî bi zimanê xwe perwerde dibin û fêrî du zimanan dibin. Zimanê ingilîzî û zimanekî cîran; yan kurdî ya suryanî. Ji bilî ziman rêbaza ku pê perwerde pê tê dayîn jî cuda ye. Di dibistanên bi rêveberiya xweser de, xwendekar tê nirxandin. Yanî pileya ku xwendekar di ezmûnê de werdigire, qedera wî ya serketin û binketinê diyar nake. Tevgera xwendekar a di dibistanê de, lêkolînên xwendekar, danûstandina xwendekar ya bi heval û mamosteyên xwe re, parastina xwezayê hemû dikevin nav nirxandina xwendekaran.

**Niha li Rojava çend zaravayên kurdî tên hînkirin? Her wiha gelo li Rojava ev xebatên ziman û zaraveyî din an zaravayên kurdî pêwendiyeke çawa bi pêş dixe?**

Perwerdeya zaravayê zazakî li zanîngeha Rojavayê û di nav çend komên xweser de tê dayîn. Lê zaravayê soranî, hewramî ... mamosteyên wan li Rojavayê tune ne lê bi rêya onlineyê tên dayîn. Yanî kesên ku dixwazin fêrî van zaravayan bibin, bi rêya komên onlineyê fêr dibin.

Pêwendiyeke xurt çêdibe. Yanî êdî hevrûkirina rêzimana zaravayan bi pêş dikeve. Her wiha hinek peyvên ku di kurmancî de tune ne li şûna ku mirov peyvên biyanî bikar bîne, mirov peyvên zaravayan din yên kurdî tîne û di nava kurmancî de geş dike.


**Gotinên te yên dawîn ji bo gelê me yê Rojava û gelê me yê li parçeyên din ê Kurdistanê çi ne?**

Ez spasiya we dikim û ji kesên ku xebata wan li ser zimên heye li gor derfetên xwe, alîkariya Rojavayê bikin. Ez ji gelê Rojava hêvî dikim ku êdî ne tenê fêrî kurmancî bibin, kurmancî bikin zimanê jiyanê, zimanê bazarê, zimanê wêje û derbirînê.



## Gulê Hesen kî ye?

Gulê Hesen ji bajarê Qamişloyê ye û heta niha jî li Qamişloyê dijî. Di sala 1994`an de ji dayik bûye. Fakulteya Ziman û Wêjeya Kurdî li Zanîngeha Rojavayê qedandiye. Ji sala 2011`an ve di nav xebatên fêrbûn û fêrkirina kurmancî de ye. Hin lêkolînên wê yên kurt li ser rêziman û wêjeya kurmancî hene. Du ji wan di kovarên cuda de çap bûne.



Ji Delav

Feratê Dengizî

# Li Omeriyan

Li nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê me. Ez û hevsera xwe, jînhevala xwe ya kedkar û cefakar bi xopana Coronayê (Covid-19) ketine. Wey li halê me be!

Îja em ên ku bi nav salan de çûne hebkî bi eks in, me bela xwe di ruhstîn jî daye, zû bi zû ruhê xwe radest nakin. Em li qata çaran li jûrekê ne ku li zinara Mêrdînê dinêre. Em her du, xweşiya jûrê jî wek ku em derketibin betlaneyê xweşhal in, de bila nexweşî û mîqrop karê xwe bikin û em ê jî li ber xwe bidin. Tew henek û tinazên me jî zêde ne. Ma di vê tofana emir de me xweşî dîtiye, bila ev jî diyariya me be, bi roj çi taştêya bilind çi esirkî, dema ku hevsera min di xew ve diçe, diçim ber paceyê ji xwe re li derve dinêrim, şiroveyan dikim. Halê min ji yê wê gelekî baştir e. Jixwe çûn û hatina cem me qedexe ye, kes serî jî li me nade, yên ku tên ji baxçe bangî me dikin û em jî ji paceyê bi xweşhalî didin û distînin.

Rojekê esirkî dîsa li derve dinêrim. Zinara Mêrdînê bi wê xweşikahiya xwe, her çiqasî payîz be jî, li ber çavên min e. Xişxişokê, Kaniya Gûzê, Nehrûk... Rihmetiyê rêhevalê min Seyda Mele Şêxmûs tê ber çavên min, wek ku li Nehrûk azan dide, na lo dengê xwe xistiye teybê, hey gidî dinyayê. Ruhê wî şadî dixwest.

Lê bala min werê li ser Xişxişokê ye û dengê rihmetiya diya min Asê di guhên min de diçingine: "Lawo em bi melê sibê re radibûn û diketin rê, Girê Şêran-Barman-Şatih-Xişxişokê û esirkî em diketin bazara Mêrdînê. Me guhertin dikir; yanî rês dida pembo dianî, rês bi du-sê qat pembo. Îja em şevekê li ser xanî radizan, sibehê me bazara xwe dikir û esirkî vedigeriyan; dîsa berevajî Zinarê-Şatih-Barman-Girê Şêran- sibehê em li mal(Dengiza)in. Me ew pembo li şikefta dolabrêsan dirist û ku dem dihat dîsa yelah Mêrdînê. Rewş wisa demveger didomiya. Kara me zêdebûna pembo ye. Îja Xalê min Hecî Izêr dengbêj û Şahneyê Hecî Ehmed Axa bû, nedihîşt diya min(xweha wî bû) Medo here guhertinê. Digot çi ji te re lazim be, ez ê hal bikim, lewma heft yetîmên qîz û diya min bi serê xwe bûn. Rojekê diçe guhertinê, li ser Kaniya Xişxişokê bêhna xwe didin, gepek nan dixwin, hew dinerin koma H. Ehmed Axayê Ewînî tê û birayê wê dest li ber guh deng berdaye, distirê. Dûrî wan ew jî xwe didin erdê. Lê dengê Hecî Izêr sewta bilbila ye, bi ber ava Xişxişokê dilorîne. Yek ji hevalên Medo dibêje; xwezî bi xweha vî dengbêjî. Yek dibêje ha, ev kurmika xweha wî ye. Diya min bitirs ku deng nere kekê wê dibêje, çima kurmik im, wele xezalek serbilind im. Herê felekê!"

Wek ku H. Izêr tev li koma wî li ber çavên min diçûrisin, herê dem û dewran e. Noqî xewn û xeyalan bûbûm.

Dengê peyamê ji telefonê hat. Min dengê Hozan Dilgeş bi strana "Xeyda ji min xeyidiye.." diyarî çend hevalan kiribû, wan jî bersiv dabûn. Bersiva yekê ji wan jî dîsa Dilgêşê dengzêrîn e ku H.Izêr dixist bîra min, îja stran "Axa me zêr û zengîn e" bû. Îja vê stranê bîra min bir Omeriya! Wey felekê, wey oxirê. Berxwedan, serbilindî û azadî. Bila be, berxwedan, têkoşîn heja ye.

Li Omeriya, li gundekî welatparêz, mêvanê milîsekî giranbuha me, xebat germ e. Karê min, berpirsiyariya min giran e. Piştî şîvan li malê razan xetere ye, divê em herin stargehekê beriya ku miraqdarên mêvanan û endamên xweşsohbeta şevbihêrkê werin, jixwe mijara şevbihêrkan jî her dem şoreş e, wek mijara her tiştên di jiyanê de. Min karê xwe yê fermî qedand û bilî ku şopekê bihêlim, me berê xwe da stargehekê, li gel çend şervanan piştî sohbeteke nîvtinazî-siyasî serî xiste xewê, wek xewa keroşkê, ka bê em çawa razan û min çend xewn û kabûs dîtin û bi niqurçandina heval me berê xwe da malê ji bo taştê, beriya ku dolmîşa gund biçe Nisêbîna rengîn. Wê demê kasetên teyban di rewacê de bû. Bi tilîka zaroka malê dengê teybê em silavkirin û ezimandin ser taştê. Wexta ku dengê Şivanî ciyê xwe da dengekî şêrîn ê raperînî, kizînî ket dilê min; herê Dilgêşo, awaza wî xweşhewaya Omeriya ya şoreşvanî dadigirt û dil û hinav dixist hênikahiya evînê û xemgîniya dîrokî ku gelê min/me çilo her dem di esargeha de ye.

*"Axa me zêr û zengîn e*
*Wan mayîn li navê danîne*
*Çi serxetî û binxetî ne*
*Em tev xelkê welatî ne*
*Em tev xelkê welatekî ne*

*Em ne serxetî û binxetî ne*
*Em tev xelkê welatî ne*
*Em tev xelkê welatekî ne."*

De ka ma gep di qirikê de namîne, ew ê çawa here xwarê. Ma rewş ewqasî zelal bi awazşêrînî tê raxistin. Mam bi hêbet û mejîkûrahî, awir û dil nizam çi hîskirin, noqî çi dîrokê bû, çendî xweşkenîna şervanan ku rastiyê bigihînin gel, di nava çi hewldan, xîret û bêderfetiyê de ne. Ê wele me azadî heq kiriye û zêdetir. Lê ka rastiya jiyanê û siyaseta cihana bêbext û kurmên darên ên bengîniyê geza nan ku bîra welat nabin, helbet sûcdariya dîrokî ya serdest û mêtingeran, xwînmêjan ku xefik li ber xefikê datînin, her der feq. Tew îja li dewsa mayînan dîwar danîne. Tirsa wan bi mayînan neçû îjarê dîwaran dirêsin, ma raman, fikir û hiş guh didin mayîn û dîwaran..! Ka Şoreşa Rojava çi dibêje, de fêhm bikin! Azadiya gel û ma heqîqet guh dide astengan! Bila bedel giran bin. Ma mayîn û dîwar dikarin li hember bawerî, hiş û mejî û rastiyê bibin asteng, ma ne her dihcrike heqîqet! Wek ava Xêbûr û Ferat.

Lê ev qirêjî tev bi xwîna zelalî paqij, ku ji kaniya welêt diherike, di her sihara Kardoxî-Mîttanî de, tê şûştin. Dê bibe xerca Yekîtiya Neteweyî jî, helbet vê xwîna zelal ew ê berjewendiyên kesîtî, eşîrî û hwd. paqij bike, ruhê yekîtiyê derxwe holê, loma dem dema yekîtiyê ye.

*"Ji bîr nekin wan şehîdan*
*Wan xweşmêr û wan egîdan*
*Ji boy welat wan serî dan*
*Ji boy welat wan serî dan.*
*. . ."*

*". . .*
*Birîn kûr in pir xedar in*
*Dijmin pîs in pir barbar in*
*Dijmin pîs in çi barbar in*

*Axa me zêr û zengîn e*
*. . . ."*

Herê wele va îro Deniza kenzêrîn, Deniz Poyraza ciwan î Omerî jî eynî wisa dibêje;

*"Birîn kûr in pir xedar in*
*Dijmin pîs û pir barbar in*
*Dijmin pîs in çi barbar in"*

Lê wê azadî bê..

Bêguman ew ê bê, bila xwînmij biteqin li gel baweriya sexte ya înkarî û redê!

Hêvî û azadî ku bi rêxistin bûn, tu astengan nas nakin!

Silav li Omeriya û Keçka Omerî..!

28.06.2021





Seyidxan Anter

# Mîtanî

Salên berî 2015'an li Nisêbînê qursên muzîk, tiyatro û yên çalakiyên mîna kitêbxaneyan, ji her kesê biçûya navenda Mîtanî û Kurdî-Derê re xuya bûn. Kurdî-Der têra xwe çalak bû. Mamosteyên dibistanan li parkên bajêr, pirtûk û çîrok dixwendin. Di navbêyna wan û kesên tizbî bazar dikirin de "pêşbirkek" hebû. Hejmarek xilbe li qehweya bin lokala Kurdî-Derê kitêb hildibijartin û dû re jî di nav xwe de guftûgo dikirin. Heta Kurdî-Derê hewl da ku dibistanekê ji bo zarokên biçûk veke, lê maqamên dewletê nehiştin.

Dewleta tirk berê çalakiyên xwe dida jin û zarokan. Lîstikên zarokan ên bi tirkî daketibûn kolanên Yeşilkentê û ji jinan re qursên fêrbûna xwendin û nivîsandina bi tirkî vekiribûn, da ku bi alîkariya jinan deriyê malan ji xwe re vekin.

Vêca çaxa ji Kurdî-Derê re digotin: "Hûn baş dikin lê hûn şaş dikin!" Pêşengên Kurdî-Derê li ber nediketin. Lewra ji xeynî li ser bingeha kurtenasiyan, xebatek li hemberî dek û dolab û planên dewletê pê ve, ji tevgera azadîxwaz a kurdî re çi rêgehek din nîne.

Ez ê serpêhatiyeke xwe ji we re bibêjim. Beriya aniha bi du salan, rojek havînê, bi minîbusê ez ji Nisêbînê diçûm Qoserê. Zarokek li ser destê diya xwe digiriya. Her çiqas diya wî bi tirkîyeke xerabe (tirkiya Mêrdînê) dixwest lawik haş bike jî fêde nekir. Min berê xwe da dayika zarok û jê re got: "Lawê te ji zimanê te fêm nake." Xatûnê berê xwe da min û li min nêrî û dixwest ji min re bêje: "Ez dizanim tu dibêjî çi!" Bi tizbiya xwe û strana ... govend ranabe va min lawik haş kir. Aramê Tîgran bi kêrî min û lawik hat.


Di heman minîbusê de, cotek bi du zarokan ve bala min kişand. Bi hev du re bi kurdî û her du zarokên xwe re bi tirkî dipeyivîn. Zilamê simbêlboq, pozberan û bibejnûbal, mobîla xwe ji berîka xwe derxist û da lawê xwe. Wa xuya bû lawik ji lîstika kuştin û wêrankariyê hez dikir. Diyalog bi tirkî bûn û zilam bi jina xwe re dida û distand. Haya wî ji bayê felekê tune bû.

Cîhana kurdî, wek tê gotin ne ewqasî tarî ye. Bi ser hemû kambaxiyan de, bihara îsal zarokên Stîlîlê û Nisêbînê bêhtir bi kurdî şor dikirin. Vêca mîna li torê dibêjin: "Şev yeka, dergeh hezar" xebata perwerdeya kurdî di malbat û nemazê mitbexên kurdan de, yek ji wan deriyan e.

Rê bidin min ez tecrûbeyeke swêdiyan bigihînim we. Li Swêdê, dema xaniyekî bikire yan jî kirê bike, mirov pêşî li mitbexê (aşxane) mêze dike. Lewra aşxane ne bi tenê jûra xwarinê ye, lê ya şevbêrkê ye, ya biryarên malbatî, civakî û polîtîk e jî. Li ser esasê vê kultura li mitbexê, xelkê tevgerê gelêrî yên wek sendîqayên karkeran, karmendan û azadiya olî, dezgehên perwerdehî û komeleyên azad ava kirine. Piraniya çîneyên swêdî endamê çend rêxistinan in. Loma jî dibêjin hejmara niştecihên Swêdê 50 milyon e. Van sendîqe, komele û dezgehên gelêrî berfireh kok dane û di gelek warên jiyana polîtîk, civakî û perwerdeyê de, pişta dewletê li erdê dane.

Îca, çaxa li Amedê Vedo strana 'Bilbilo lo' bibêje, Bager li tembûrê û Nimet jî li zirnê dide, dawet geş dibe û zavê jî xweş govendê digire!





# ‘Hêza berxwedana wan ji mafdariya wan bû’

■ Mehmet Alî Ertaş

Parêzer Kazim Bayraktar ê ku parêzeriya Kemal Pîr û Mehmet Hayrî Dûrmûş dikir, qala rojên zindana Amedê yên sala 1982’an kir. Bayraktar, destnîşan kir ku Zindana Amedê dişibiya Kampa Naziyan

Parêzer Kazim Bayraktar ê ku parêzeriya Kemal Pîr û Mehmet Hayrî Dûrmûş dikir, qala rojên zindana Amedê yên sala 1982’an kir. Bayraktar, destnîşan kir ku Zindana Amedê dişibiya Kampa Naziyan.

Zindana Amedê, li aliyekî cihê îşkence, înkar, heqaret û lêdanê bû. Li aliyê din cihê berxwedan, biryar, sekn û têkoşînê bû. Li aliyekî nûnerên dewletê, li aliyê din jî nûnerên gel hebûn. Her ku nûnerên dewletê rêjeya îşkence û neheqiyê zêde kirin, girtiyên siyasî jî bêhtir li ber xwe dan. Herî dawî li dijî vê îşkenceya giran di 14’ê tîrmehê de biryar dan ku êdî dest bi rojiya mirinê bikin.

Girtiyên siyasî di 14’ê tîrmeha 1982’yan de li zindana Amedê, li dijî tundî û înkara dewletê dest bi berxwedanê kirin. Pêşengê PKK’ê M. Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Alî Çîçek û Akîf Yilmaz, li dijî polîtîkayên înkar û îmhayê dest bi rojiya mirinê kirin. Li Girtîgeha Hêjmar 5 a Amedê, di serî de qadroyên pêşeng ên PKK’ê, îşkence li piraniya girtiyên li zindanê dihat kirin. Li dijî van îşkenceyan, qadroyên pêşeng ên PKK’ê dest bi berxwedanê kirin. Lê niha hiyarerşiya sivîl, dijzagonî û qirêj heye.

Parêzer Kazim Bayraktar ku wê demê parêzeriya Kemal Pîr û Mehmet Hayrî Dûrmûş dikir û bû şahidê îşkence, tundî û polîtîkayên wan rojan, ji rojnameya Xwebûnê re qala wan rojan kir.

Prz. Kazim Bayraktar anî ziman ku wê demê parêzeriya Kemal Pîr û Mehmet Xeyrî Dûrmuş ên di sala 1982’an de li Zindana Amedê di berxwedana rojiya mirinê de nemir bûn, dikir û wiha got: “Wekî buroya parêzeran me parastina Mazlum Dogan, Riza Altun jî di nav de parastina nêzî 20 PKK’yiyan dabû ser xwe.”

**‘Nikaribûn li dora xwe binêrin’**

Bayraktar da zanîn ku mirov nikaribû ji wî meskenî re bigota girtîgeh û wiha axivî: “Wekî ku kampên komkirinê yên Naziyan bû ku te digot qey di serdema faşîzma 12’ê îlonê de li Tirkiyeyê xwe nûjen kiriye. Di dîrokê de komkujî û hovîtiya li dijî kurdan xwe nûjen dikir. Ji avahiyên polîsan dest pê dikir, heta nava dîwarên van kampan qat bi qat zêde dibû. Her cureyên hovîtiya giran li wir dihat kirin. Travmaya derûnî rê li ber teslimiyetê vekiribû. Ji bo muwekîlên me bi me re hevdîtinê bikin, zor li wan dikir û sirûdên nijadperestî bi wan didan gotin. Di danişînên dozê de disîplîna eskerî li ser wan ferz dikir. Bêyî destûra eskeran nikaribûn biaxivin. Piştî destûrê diketin sekna “Amadehiyê” û kunyeya xwe dixwendin. Heta dawiya danişînê destê wan li ser çongên wan bû. Nikaribûn li dora xwe binêrîyana. Em parêzer bûn şahidê vê yekê.”

Bayraktar diyar kir ku wan bi heyeta dadgehê re niqaş dikir lê fêde nedikir û wiha got: “Ji bo em muwekîlên xwe bi tenê nehêlin me dadgeh boykot nedikir. Li girtîgehê dema hevdîtina bi muwekkîlên me re tenê 1 deqîqe bû. Bi lêdanê dianîn salonê û dibirin. Ji ber vê yekê em bi fikar bûn biçin ziyareta girtiyan.”

**Sê armancên îşkenceyê**

Bayraktar destnîşan kir ku sê armancên polîtîkaya îşkenceyê hebûn û wiha lê zêde kir: “Armanca ewil, dûrxistina fikrî, kesayetiyeke bênasname û di aliyê ruh û siyasî dekuştin bû. Armanca duyemîn di lêpirsînê de, bide axaftin, li gorî xwe bersivan jê bigire, delîlan kom bike bû. Armanca sêyemîn jî dixwest gelan û hêzên muxalif çavtirsandî bike. Bi vê rêbazê civakê û muxalifan lawaz dikin. Lê tu carî bi temamî nagihêje armanca xwe. Îqtîdara faşîst hebûna xwe bi tundî, zext, bişaftin, zordarî, îşkence, komkujiyan berdewam dike. Difikire bi ser ketiye, lê bi kabûsê hişyar dibe. Mînaka herî şênber encama darbeya 12’ê îlonê ya faşîst e. Tevgera gelê kurd rabû ser piyan. Berxwedana Rojiya Mirinê ku li Zindana Amedê dest pê kir û “Çalakiya Çaran” bû guleya hişyariyê ya vê tevgerê. Ceribandina faşîzmê ya li Amedê bi têkçûnê bi encam bû. Gelê kurd bêtir bi hêz bû û derket pêşberî wan.”

**‘Baweriya mafdariyê…’**

Bayraktar, li ser hêza têkoşîna girtiyên siyasî jî axivî û ev tişt got: “Yek ji sedemên ku li dijî vê zilm, îşkence û tundiyê bû hêza berxwedanê, baweriya mafdariyê ya ji dil bû. Ev yek bi dirûşmeya “Em mafdar in em ê bi ser bikevin” şênber bû. Ev ne hêzeke tekakesî bû. Ev hêzeke kolektîf bû.”

Bayraktar, bal kişand ser darizandin û zagonên wê demê û wiha pêde çû: “Di faşîzma 12’ê îlonê de zagon bi îmzeya 5 generalan dihat sazkirin û dixistin meriyetê. Wekî zagonên Konseya Ewlehiya Millî (MGK) dibûn fermî. Serokwezîr û wezîr ango hikûmeta li ber çav ji aliyê wan ve dihatin peywirdarkirin. Piranî esker bûn. Darizandinên siyasî ji aliyê dadgehên eskerî ku 5 generalan kontrol dikir ve pêk dihat.

Rêveberên girtîgehan esker bûn. Îşkence û zilma dihat kirin, ji îqtîdarê ne serbixwe bû. Hikûmet û cuntaya faşîst a 12’ê îlonê, ji bo perdeyê têxin nava têkiliya xwe daxuyaniyên durû didan. Îro jî wisa ye. Ji bo em vê yekê bibînin, divê em li doz û darizandinên kujerên nediyar binêrin ka çiqas bi encam bûne. Bi armanca parastina dewletê ya klasîk, bi awayekî şiklî bûya jî hiqûq hebû. Lê îro rêveberiya “yekzilamî” û şirîkê wî yên sûc hene. Bûne navenda siyasetê. Wekî hîyarerşiya reîsan û berjewendiyan dixebite. Ji darizandina tu rêveberê cemaweriyê natirsin.”

**Darazê kirine amûra siyasî**

Bayraktar, bal kişand ser pergala daraza siyasal a faşîzma 12’ê îlonê û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Di pergala daraza siyasal a faşîzmê de li ser bingehê hiyerarşiya leşkerî pêş diket. Darazê hemû erka siyasî xistibû kontrola xwe. Daraz bi temamî di kontrola 5 generalan de bû. Fermandarê rewşa awarte dikaribû biryara dadgehê temyiz bikira. Lê dîsa ew pêkanîn ne bi qasî îro keyfî û bê rêgez bûn.”

**Pergala darazê ya îro**

Bayraktar, bal kişand ser cudahiya daraza wê demê û niha û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Aliyê dadgehên di kontrola faşîzma 12’ê îlonê û dadgehên bloka îqtîdara îro yên dişibin hev hene. Conta jî û îqtîdar ji bo muxalefeta siyasî tune bike, darazê dike çek û bi kar tîne. Lê di pergala daraza îro de hiyerarşiya leşkerî tune ye. Hiyarerşiya du mirovan (Erdogan-Bahçelî) heye. Li ser têkiliyên dijzagonî yên qirêj hatiye avakirin. Sînorê faşîzma 12’ê îlonê derbas kiriye. Îro pêdiviyê bi delîlên şênber nabînin. Bêyî delîl dikarin bigirin û ceza bibirin. Heta niha çiqas hikûmet hatin û çûn dest nedan cewherê Destûra Bingehîn a 12’ê îlonê.”

# Qutkirina avê rêbaza tevkujiya gelê kurd e

■ Bahadîn Akhan

Dewleta tirk piştî dagirkirina hin herêmên rojavayê Kurdistanê niha jî bi hin rê û rêbazên dagirkeriyê hewl dide demografiya herêmê biguherîne. Di vî milî de jî Çemê Firatê wekî amûrekî şerê taybet bi kar tîne û dibe sedema koçkirina şêniyên Rojava. Her wiha Tirkiye polîtîkayên xwe yên girêdayî şerên avê derbasî bakurê Kurdistanê dike. Li Êlihê, li Qoserê, li Şirnexê û gelek deverên din ên bakurê Kurdistanê gelek gund û tax bê av tên hiştin. Der barê van polîtîkayên Tirkiyeyê de me bi endamê Rêveberiya Giştî ya Bendavên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Mehmûd Terbûş re xeber da.

Terbûş di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser armanca Tirkiyeyê ya ji qutkirina avê û ev yek anîn ziman: “Armanca dewleta tirk ew e ku dixwaze bi her awayî şerê bi kurdan re bimeşîne. Nexasim jî dixwaze vî şerî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêş bixe. Nêzî 5 milyon kes li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijîn. Ava Firatê jî diyardeyeke sereke ya jiyanî ye ku gel bêyî wê nikare jiyana xwe bidomîne. Gelek herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê; Kobanê, Minbic, Tebqa, Reqa û beşek ji Dêrê û beşek ji Hesekê ji vê avê vedixwe. Derveyî vê aboriya vî miletê ku li ser vê axê dijî bi giştî li ser vê avê ye. Li gelek herêman çandinî, zevî, genim û cehên wan bi vê avê têne avdan. Dewleta tirk baş dizane ku jiyan û debara şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi avê ve girêdayî ye. Ji ber vê jî dixwaze ku vî gelî li vê herêmê bide koçberkirin. Her wiha dewleta tirk li herêmê şerê leşkerî da meşandin, dû re rêbazên şerê taybet li ser gelê herêmê da meşandin. Niha jî şerê avê dimeşîne.”



**Bendav nexebitîn…**

Terbûş wekî encamekî qutkirina avê, behsa rewşa karebayê ya li herêmê kir û wiha got: “Xaleke girîng jî karebaya herêmê ye. Heke ev bendav nebin, dabînkirina karebayê pir zehmet e. Sê bendav li ser vî çemî hene; Bendava Rojava li Minbicê, Bendava Firatê li Tebqayê, bendava Azadiyê ew jî li gundewarên Reqayê ye. Kareba tenê ji her sê bendavan tê peydakirin. Ev bendav neşuxilin li vir şert û mercên jiyanî bi talûkeyan re rû bi rû dimîne.”

**Hevpeyman tê binpêkirin**

Mehmûd Terbûş têkildarî hevpeymanên navneteweyî yên ku divê Tirkiye li gorî wan tevbigere jî axivî. Terbûş behsa rêjeya avê ya hatiye kêmkirin kir û ev agahî dan: “Çavkaniya Firat û Dîcleyê li bakurê Kurdistanê ye. Lê niha di bin dagirkeriya dewleta tirk de ye. Niha ev av jî di destê wan de ne. Ji ber vê yekê Sûriye û Iraq ji aliyekî ve neçar in. Bes li gorî hevpeymana navneteweyî ya di navbera Tirkiye, Sûriye û Iraqê de hatiye îmzakirin, divê 500 metroseçoşe av di saniyeyekê de derbasî axa Sûriyeyê bibe. 200 metrosêgoşeyê vê ji bo xerckirina Sûriyeyê ye, 300 metrosêgoşeyê wê jî ji bo Iraqê ye. Lê niha di saniyeyekê de 200 metrosêgoşe av tenê derbasî axa Sûriyeyê dibe. Ji 27’ê meha çileyê heta îro ji 200 metrosêgoşeyî av derbas nebûye.”

**Zarok bi jehrê ketine**

Girêdayî qutkirina avê nexweşî û bijehrêketina şêniyên li herêmê her diçe zêdetir dibe. Terbûş der barê şert û merc û talûkeyên ku niha herêm pê re rû bi rû maye ev yek bi lêv kirin: “Jixwe bandora qutkirina avê di gelek waran de dixuyê. Gelek bajar ji vê avê vedixwin. Ji bo me jî aliyê herî girîng ê vê yekê rewşa ava vexwarinê ye. Niha ev çendek e li Kobanê û li Reqayê rewşên jehrîbûyînê peyda dibin. Ji ber ku av naherike, xwe paqij nake û nayê paqijkirin zarok zû bi zû bi jehra avê dikevin. Ev milet bi giştî ji vê avê vedixwe. Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser demekê berê daxuyaniyek belav kir û diyar kir ku zêdetirî 1400 zarok ji ber paqijnekirina avê bi jehrê ketine. Li herêma Reqayê jî bi heman rengî zêdetirî 4000 hezar zarok nexweş ketine. Em bendavan ji 24 saetan tenê 8 saetan dixebitînin. Em 16 saetan avê kom dikin û 8 saetan jî avê belav dikin. Vê yekê jî bandoreke pir mezin li gel, li herêmê kiriye.”

**Rêbaza şer a Tirkiyeyê**

Terbûş axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Jixwe me behs kir aboriya gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji sedî 70’yî li ser çandinî û ziraetê ye. Çandinî debara jiyanî ya gelê herêmê ye. Her wiha ji ber kêmbûn û qutkirina avê herî zêde bandor li çandiniyê kir. Em dikarin bibêjin ku îsal ji sedî 60 zeviyên genim yên li herêmê xera bûn. Meseleya avê meseleyeke mirovahiyê ye. Mafê milet e. Divê ev av tu carî nebe amûra siyaset û şer. Lê belê dewleta tirk vê yekê wekî rêbazeke xwe ya daîmî dimeşîne.”

## ‘Civîna Astanayê li dijî Rojava ye’

Di 8’ê tîrmehê de Civîna Astanayê ya ku Tirkiye, Îran û Rûsya tev lê bûn hat lidarxistin. Encamnameya Civîna 16’an ya Astanayê ji yên berê helbet ne cudatir bû. Her sê dewletan dijminatiya xwe ya li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dubare kirin.

Li gel ku her sê dewlet -bi taybetî jî Tirkiye- bi salan e ku serweriya Sûriyeyê bin pê dikin jî di civînê de gotin ku ew girêdayî serweriya Sûriyeyê ne. Dewleta tirk derdora ji sedî 12’an rûbera Sûriyê dagir kiriye, Rûsya bi hikumeta Şamê ya lawaz re gelek lihevkirin îmze kirin ku bi rêya wê, welatê Sûriyeyê yê parçekirî, xistiye bin serweriya xwe.

Têkildarî civînê Hevserokê Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Riyad Derar axivî û wiha got: “Naveroka civînê, heman naveroka encamnameyên civînên berê ye. Hemû li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne. Li gor xuya dike dê şerek an êrîşeke din pêk were.”

Derar bal kişand ser hevsengiya di navbera kiryarên Îtîlafa Sûriyeyê û her sê aliyên Astanayê û ev tişt anî ziman: “Diyar e ku nûnerên îtîlafê siyaseta Astanayê erê dikin. Bi wan kaxizan dilîzin ku tevlihevî û fitne û pirsgirêkan li herêmê derbixin.”

Derar piştrast kir ku her sê aliyên Astanayê planên demdirêj li gel tunebûna Amerîka û Ewropayê amade dikin û wiha pê de çû: “Gelek pirsgirêk wê rû bidin divê em li ber xwe bidin.” ***QAMIŞLO***

# ‘Divê bi lezgînî kongre çêbibe’

Navenda Nûçeyan

**Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê-Rojava li Qamişlo komxebatek bi boneya yekitiya neteweyî li dar xist. Der barê komxebata KNK’ê de rojnameger Ekrem Berekat axivî**

Komxebata ku ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê-Rojava ve hate birêxistinkirin, piraniya partiyên kurdî yên li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, rêxistinên civakî, sivîl, rêxistinên jinan û rêxistinên ciwanan beşdar bûn.

Komxebata ku bi dirûşmeya ‘Bi yekitiya neteweyî em ê dagirkeriyê têk bibin û rê li şerê navxweyî bigirin’ dest pê kir ji du beşên sereke hat birêxistinkirin. A yekemîn xeteriyên Tirkiyeyê ya li ser Kurdistanê bû. Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê (PDKS) Cemal Şêx Baqî û endama rêveberiya desteya rêveber a KNK-Rojava Ebîr Hesab di vê beşê de pêşkeşî kirin. Di beşa duyemîn de jî helwesta kurdî ya di vê qonaxê nîqaş kirin. Endama Desteya Hevserokatiyê ya PYD`ê Foza Yûsif û parêzer Fadil Mûsa axivîn. Em li ser Komxebata KNK-Rojava bi rojnamgerê Rojava Ekrem Berekat re axivîn.

**ENKS beşdarî komxebatê nebû**

Rojnameger Ekrem Berekat destnîşan kir ku komxebat ji aliyê komiteya KNK’ê ya Rojava ve li bajarê Qamişlo yê girêdayî herêma Cizîrê hat lidarxistin û wiha axivî: “Armanca sereka ya vê xebatê ew bû ku helwesteke giştî li beramberî dewleta tirk a dagirker bê pêkanîn û di heman demê de ji bo ku şerekî navxweyî di navbera gelê kurd de neyê qewimandin. Di çarçoveya li beramberî vê çawa bê sekinandin de xebat hatin meşandin.”

Ekrem Berekat da zanîn ku vexwendname ji hemû partî, rêxistin û saziyên li rojavayê Kurdistanê re hat şandin û wiha got: “Lê weke her carê dîsa partiya ENKS’ê beşdarî vê komxebatê nebû. Jixwe ev jî ji aliyê kesên ku beşdarbûyîn ve hat rexnekirin û diyar kirin ku ji vê helwestê tê xuyakirin ku heta niha Encûmena Niştimanî ya Kurdî helwesta xwe li beramberî dewleta tirk a dagirker diyar nekiriye. Di heman demê de beramberî ku şerekî navxweyî derkeve jî bê biryar e. Ev yek jî xizmeta dewleta tirk ya dagirker dike.”

Berekat di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku êrîş û xeteriyek pir mezin a Tirkiyeyê li ser gelê kurd heye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Armanca Tirkiyeyê ew e ku gelê kurd tune bike, hebûna gelê kurd û destkeftiyên gelê kurd ên di van salên dawiyê de hatin qezenckirin tune bike û ji holê rabike. Tişta ku di vê de hate xuyakirin dewleta tirk çi destkeftiyên gelê kurd li ku hebe wê derê hedef digire û niha şerê dewleta tirk ê ku li başûrê Kurdistanê dimeşîne şerekî ji bo dagirkeriyê ye. Bahaneyên dewleta tirk ku divê ev şer li dijî PKK’ê ye ne rast in. Dewleta tirk hebûna gelê kurd giştî hedef digire û pêwîst e gelê kurd li dijî vê bê helwest nemîne. Ji ber ku dewleta tirk dixwaze başûrê Kurdistanê dagir bike û berê xwe bide herêmên din ên weke rojavayê Kurdistanê û wir jî dagir bike. Armanca Tirkiyeyê tenê ne partiyek e, ne hêzek e armanca wê tevahî gelê kurd e û destkeftiyên gelê kurd e.”



**Dê biryar bê nîqaşkirin**

Ekrem Berekat der barê nîqaş û nirxandinên ku di komxebatê de hatine kirin jî ev agahî dan: “Di komxebatê de mijara herî sereke ew bû ku pêwîst e di vê demê de çi bê kirin. Bi giştî nirxandinên ku hatin kirin, nêrîn û pêşniyarên hatin dayin ew bû ku divê gelê kurd helwesta xwe diyar bike. Hemû hêzên kurdî divê li beramberî êrîş û dagirkeriya dewleta tirk bê helwest nemînin û sekna xwe diyar bikin. Pêwîst e bi rengekî lezgîn jî kongreyeke neteweyî bê lidarxistin. Ji bo ku stratejiya gelê kurd bê diyarkirin û di heman demê de hebûna gelê kurd, çand û zimanê gelê kurd bê parastin. Ew hêzên ku ji yekitiyê direvin werin dawetkirin ku ji bo gelê kurd helwesta wan jî bê aşkerakirin.”

Berekat, da zanîn ku piştî komxebatê wê hinek pêşniyaran bigirin û li gorî wan pêşniyaran jî komîteyekê ava bikin. Ev komîte dê der barê helwest û biryarên ji komxebatê derketin, bi hêzên başûrê Kurdistanê re nîqaş bikin.

**‘Hinek ji yekitiyê direvin’**

Ekrem Berekat herî dawî li ser girîngiya komxebatê ev tişt got: “Xebateke di vê astê de pir girîng e ku di vê demê de hat lidarxistin. Demeke dirêj e ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rastî êrîşan tê. Tirkiye 70 roj in êrîşî qadên başûrê Kurdistanê dike. Xebateke bi vî rengî wê girîngiya xwe ne tenê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, dê li ser Kurdistanê giştî jî bike. Ji ber ku di vê komxebatê de pêwîst e hinek biryar û encamname derkevin. Van xalan jî wê bi hêzên kurdistanî re bên nîqaşkirin û helwesteke tund li dijî hêzên ku ji yekitiya neteweyî direvin û li dijî Tirkiyeyê bê helwest dimînin re bê nîşandan.”

# Em Zapatîsta ne



Sozdar Koçer







“Em Zapatîsta ne, em li vê derê ne. Ji bo ku em werin dîtin, em rûyê xwe vedişêrin; ji bo em werin binavkirin, em navên xwe diguherin; em ji dema niha bawer in, ji bo ku pêşerojeke me hebe û ji bo ku em bijîn, em dimirin. Em Zapatîsta ne, ku piraniya wan xwecihên bi koka Maya ne - em xwe nafiroşin, em xwe teslîm nakin û em dev jê (ji dozê) bernadin.”

Ev çend gotinên Subcomandante Insurgente Moisesî ne, yên ku di daxuyaniya xwe ya Tebaxa 2019’an de bi raya giştî re par ve kiribû.

Di havîna îsal de wê nêzî 160 kes - delegasyoneke mezin ya Zapatîsta ji Chiapas a Meksîkayê berê xwe bidine Ewropayê. Rv delegasyona Zapatîstan bi navê EZLN (Ejército Zapatîsta de Liberación Nacional) - Artêşa Zapatîstayan ya rizgarîkirina neteweyî jî tê naskirin.

Delegasyona yekem ku gihîşt Ewropayê ji 7 kesan pêk tê - 4 jin, 2 zilam û kesek bêzayend. Ev delegasyona yekem ji girava “Isla Mujeres” li Golf a Meksîko berê xwe bi keştiyê dane Ewropayê. Ew piştî 6 hefteyan gihîştine bajarê Vîgo yê Galîsya ya Ispanya yê. Grûbên dîtir jî li pey hev, bi heman şêwazî di demên pêş de dikevin rê. Ji wê derê wê tûra wan a Ewropayê dest pê bike. Hûn ê bi mafdarî bipirsin, ma gelo balafir qeliyabûn? Hewqa dem wenda kirin û eziyetê dane xwe û bi keştiyê hatine Ispanyayê. Rast e, lê jixwe ya herî balkêş jî ev e. Wan ne ji xwe re û ji me re, lewra bi zanîn û lêhûrbûn ev rê, welat û bajarê Vîgo hilbijartine.

Di 13’ê tebaxa 2021’ê de dagirkeriya Meksîkayê bi destê Ispanyayê dikeve 500 salîya xwe. Ango di 13’ê tebaxa 1521’ê de Ispanyayê gelek dewletên Amerîkaya Latîn xistin bin mêtingeriya xwe, Meksîko jî yek ji wan dewletan bû. Bi rêya deryayê, bi keştiyan li parzemînên ji bo wan “nû” sekinîn û bi perspektîva ku axek nû dîtine û êdî ya wan e, gelên xwecihî bindest kirin, kirin kole û malê xwe, zenginiyên binerd û sererd kirin yên xwe - bi kurtasî li mirov û xwezayê mijîyan, talanî, tunekirin, qirkirin û ferzkirina ola xaçparêziyê û zimanê îspanyolî, ku heta îro jî bandora mêtîngeriya îspanyolî xwe bi zelalî di jiyanê de dide der. Mirov ji xwe dipirse, ma gelo bira beriya îspanyolên dagirker werin, qey jiyan, ziman, çand û dîroka wan xwecihîyan tune bû?

Em vêya bi erdnîgariya ku em nas dikin re fiktîv/xeyalî bînin ziman: Dema Tetwanî rabin û ji bitir û betalî li keştiya xwe siwar bibin û di golê de bigerin û bi tesadufî leqayî Wanê bên û bêjin, a weleh me bajarekî ji xwe re keşif kir! Êdî mirov, mal, heywan, erd, zengînî, çand - her tiştê di wî bajarî de yê Tetwaniya ye. Wanî rabin û bêjin heyran, ma ne em jî hene - beriya ku hûn me bibînin jî em hebûn. Rastîya civaka me, ol, ziman, çand û jiyaneke me hebû û hîn heye. Lê ev neyê qebûlkirin, di şûnê de zordestî, qirkirin, desteserkirina erd, mal û mirovan dest pê dike. Êdî jê bazirganiya erzaq û firotina koleyan li sûka Tetwanê dest pê bike - miftî belaş. Ji me re pir ecêb tê ne wisa?

Hema bêje metîngeriya ji aliyê dewletên rojavayê cîhanê (global north) li parzemînên başûrê cîhanê (global south) bi vê zîhniyeta dagirkerî û mêtîngeriyê pêk hat û hîn jî bi şêwe û maskeyên nû berdewam pêk tê. Li hemberî vê dagirkerî û qirkirinê çermsorên Meksîkoyê bi serkêşîya Emiliano Zapata xwe li dijî van rêbazên tunekirinê bi rêxistin kirin û gelek serhildan pêk anîn. Wan li çiyayên xwe hêza artêşî - EZLN ango gerîlayên xwe ava kirin û gel û herêmên xwe li dijî dagirkeriya Meksîkoyê parastin. Di sala 1994’an de - bi projeya mezin ya dewletên kapîtalîst ên serwer - Amerîka , Kanada û Meksîko hevpeymana bazirganiya serbest hate îmze kirin. Bi vê peymanê re - EZLN tevî gelên çermsor hem li Chiapas û hem li cihên ku ev hevpeymana bazirganiyê pêk bihata, serî hildan.

Ji sala 1994’an ve, rêxistina Zapatîsta û milê wê yê artêşî EZLN bi hev re li dijî talankirinê, mêtîngeriyê û li dijî nijadperestiyê têdikoşin. Gelên zapatîsta li hemberî pergala dewletê ku wan marjînal dike, pergala xwe ya civakî ava kirin û xweserî li herêmên xwe îlan kirin. Wan gund û navçeyên xwe bi rêxistin kirin, dibistanên xwe yên pirzimanî ava kirin, nexweşxaneyên xwe tevî pergala xweser a tendurustiyê, navendên siyasî û çandî hwd. ava kirin, bi kurtasî wan jiyana xwe bi pergala xwe ya alternatîv, demokratîk û xweser bi xwe ava kirin. Heta îro gund û navçeyên xweser bi “meclisa rêveberiya baş” xwe bi rexistin dike û qadên xweseriyê berfirehtir dike. Mirov dikare bibeje ku di navbera pergala xweseriyê ya Zapatîsta û Rojava de gelek paralel hene.

**Ev Delegasyon çima tê Ewropayê?**

Di destpêkê de wan xwest bi hatina xwe re dîmenekî berovajî di hişê mirovahî û dîrokê de bihêlin. Bi sedan sal in ku perwerdeya dîrokê û dîmenên ku di hişê meriv de ava kirine, ev in ku ewropî dergûşa şaristaniyê û civakeke pêşketî ye û cîhana derdor hov û paşketî ne. Ew her bi keştiyê geriyane û parzemînên din keşif kirine û xwestine gelên xwecihî ji cehaletê rizgar bikin.

Li bo ku ew van dîmenan bi awayekî sembolîk bişkînin, ew bi keştiyê hatin Ispanyayê û li bajarê ku mêtîngerên dawî yên îspanî di vegera xwe ya ewropayê de lê sekinî bûn - li Baiona ya Vigoyê, wan jî keştiya xwe li wê derê sekinandin. Ferq û cudahiya wan ew e ku Zapatîsta nehatine ji bo rêbaza dagirkeriyê ya ku li wan hatibû kirin, dubare bikin. Na, ew dibêjin: “Ev dagirkeriyeke wisa ye ku jiyanê diçîne û ji bo fêmkirina ku kapîtalîzm derbasî/ketiye hundirê me tevan. Lewra divê em hemû şiyar bibin. Hêvîdar im ku zengîn jî hişyar bibin […].”

Ev Delegasyona hatî û qismê din hîn jî di rê de ye, wê li 30 dewletên Ewropayê bigerin û nîqaşên siyasî bi proje, sazî û gelên ewropayî re çêbikin û banga giringiya xwe birêxistinê bikin. Banga ewropayeke çep û ji xwar ve bikin.

# Kurdên êzidî yên li Gurcistanê

Burhan Korkmaz

Ez gelekî kelecanî bûm ku diçûm Gurcistanê, ji zarokbûnê heya niha di nava xeyalên min de dîtina Batûm û Tiflîsê hebû, êdî digihîştim mirazê xwe.

Min pasaporta xwe dirêjî polîsa gurcî kir û li bendê mam ku min derbas bike, çend pirsên wekî "Tu ji bo çi diçî Gurcistanê", "Gelo cara yekem e?" hwd. ji min pirsîn. Min jî bersiv dan û di deriyê sînorê Gurcistanê re derbas bûm û ketim hundirê Gurcistanê.

Çend rojan li Batûmê mam û paşê min berê xwe da Tiflîsê. Min dixwest xeyaleke xwe ya din jî pêk bînim. Ez bi otostopê digeriyam, pereyên min zêde tune bûn û otostop jî bê pere bû, ji ber wê yekê otostopê ez xilas kirim. Carina demeke dirêj li ser rêyan disekinîm. Lê dîsa jî digihîştim mirazê xwe. Û naxwazim vî ji bîr bikim, min bihistîbû ku gelek kurdên êzidî li Gurcistanê dijîn. Heger tiştekî wisa hebe jixwe dê alîkariya min bikirana, ji aliyê ziman ve, ji aliyê ger û seyranê ve. Wê mêvanperweriyê kêfa min xweş dikir.

Piştî çend saetên din siwareyek bi rengê zer hat li ba min sekinî, xortek di nav de bû. Ez jî zû bi zû siwareyê siwar bûm û min silava xwe da û rûniştim. Em bi hev re bi zimanê îngilîzî axivîn. Bi rastî ne îngilîziya wî û ne jî ya min perfect bû, hema bi tenê me hevûdu serwext dikir û ew qas.

Ji min pirsî û got "Tu ji ku yî ?" Min jî bersiv da û got "Ez kurd im û ji Kurdistanê me" çavên xorto vebûn û li min dinêrî, serê xwe hejand û got "Çi!" min jî dîsa dubare kir û dîsa got "Ez kurd im û ji Kurdistanê me". Xorto dîsa tiştekî ji min fêm nekir. Bawer im min deh car zêdetir jê re got "Ez kurd im" lê mixabin dîsa jî fêm nekir ku ez behsa çi dikim. Ez jî şaş mam. Min di dilê xwe de got "ma ew henekan li min dike?"

Paşê hat bîra min ku ez bêjim "êzidî" û dema min got êzidî, wî jî got "haaaaaa êzidîîî!" min jî got "erê". Çi tiştekê ecêb bû, xorto kurdan nas nake lê dema min got êzidî fêm kir. Ji ber çi?

Ez gihîştibûm Tiflîsê, çend roj li vir jî geriyam û rojekê dîsa li kolanekê digeriyam. Yekî wêneyên xêzkirî difirot û gelek jî bala min kişand. Çûm balê û min fiyet pirsî. Paşê ji min pirs kir û got: "Tu ji ku yî", min jî bersiv da: "Kurd im û ji bakurê Kurdistanê me" dema min wisa got xalo dest pê kir û bi kurdî bi min re axivî. Yekem kesê êzidî ku min nas kir ew xalo bû. Bi rastî kurdiya wî ji ya min çêtir bû, em hinekî li ser piyan axivîn û ez gelek tiştan jê hîn bûm. Sedsalek berê êzidî hatibûn vir. Nifûsa wan berê nêzî 70-80 hezar bûn. Lê niha maye 20-30 hezar. Ji ber ku piraniya wan koçî Ewropa, Rûsya û çend welatên din kirin. Gelek êzidî li Ermenistanê jî hebûn, xalo agahiyên wisa dan min.

Li ser medyaya dijîtalê min Memo nas kir. Me hevûdu dît û em bûn hevalên hev. Êzidî bû. Rojekê got were mala me û bibe mêvanê me. Ez jî gelek kêfxweş bûm û çûm. Min malbata Memo nas kir û ew qas mêvanperwer bûn ku bi peyvan nikarim bînim ziman. Wêneyên Beyta Laleşê li dîwaran hebûn û yên Melekê Tawis, heya wê demê min wateya Melekê Tawis nizanibû. Lê bi saya Memo ez fêr bûm. Bi saya Memo min gelek êzidî nas kirin û her roj dibûm mêvanê malbatekê.

Ji vodkayê hez dikirin. Êvaran li ser şîvê li ser sihetê, li ser pêşeroja xwe û ji bo miriyên xwe qedeh bilind dikirin. Piranî xwarinên gurciyan çêdikirin, lê xwarinên kurdan jî çê dikirin. Tiştê ku ez pê şa dibûm zimanê xwe ji bîr nekiribûn, Her kesî dizanibû bi kurdî biaxive û di nav xwe de jî bi kurdî diaxivîn. Paşê rojekê min ji Memo pirsî û got: "Gelo çima li Gurcistanê êzidiyên li vir, bi navê êzidî tên nasîn û çima bi navê kurd nayên nasîn?"

Memo got: "Ji ber ku hinek êzidî bawer dikin ku peyva êzidîtî ji pêşiya kurd hebûye û hemû kurdên li ser rûyê cîhanê pêşî êzidî bûn. Hinek kes an dînên din qebûl kirin û ji êzidîtiyê derketin. Yanî bawer dikin ku dema kurd bûn misilman û xirîstiyan û yên din, êdî ew dîsa nikarin bibin êzidî. Dîroka dînê(baweriya) êzidîtî digihêje pêşiya çar hezar salan. Ya îslamê jî hezar û nîv e. Ji ber vê yekê li ser rûyê erdê dînê herî kevnar a baweriyê bi yek xwedayî dike, êzidîtî ye. Ji ber wê jî hin êzidî vê fikirê diparêzin"

Min dîsa pirsa "Gelo li gorî baweriya êzidiyan û kesên êzidî, ew zimanê hûn diaxivin çi ye?" pirsî.

Wî got: "Heval, ew kesên ku parastina vê fikirê dikin û dibêjin êzidî ne kurd in di hezaran da yek in. Em gelemperî êzidî kurdbûna xwe qebûl dikin û bi vê jî serbilind in. Em hemû jî Kurdistanî ne, Em hemû jî kurd in û yek xwîn in. Zimanê me yek e, çand a me yek e, belê gelek dîn û bawerî di nav me de heye lê em hemû jî yek laş in. Çend caran ferman li ser me êzidiyan rakirin, xwestin ku me biqelînin, xwestin ku me talan bikin, ji ber ku baweriya me yanî êzidîtî baweriyeke xirab e û baweriya agir û nizanim çi dike. Yên ku me nas nakin nizanin êzidîtî jî dînekî Xwedê ye û dînekê qedîm û pîroz e."

"Ji kerema xwe ji min re hinek behsa baweriya êzidîtiyê bike"

"Di baweriya me de Êzda (Xweda) bi tenê avakerê cîhanê ye û karên ku mayî ji destên Melekê Tawis û çend melekên din hatine qedandin. Du mirov hebûne û heştê zarokên wan. Ev her du mirov ruhên xwe dixêrin di nav kavanozekî de û lê dinêrin ku ji ya mêr de xortekî çeleng derkeve û ji ya jin de jî heywanên ne baş derkevin. Paşê bavê zarokan zêde ji vî xortî hez dike û wextê xwe bi wî re derbas dike. Dayika zarokan jî ji vê rewşê aciz dibe û hesûdiyan dike. Dixwaze vî xortî bikuje, lîstikekê amade dike û parolayekê datîne ser û diçe ba zarokên xwe ku behsa vê lîstike bike. Lê tiştekî ji bîr kiriye, haya Melekê Tawis ji vê lîstikê hebû, Melekê Tawîs diçe pif dike devê wan hemû zarokan û her heştê zarok jî êdî zimanekî din diaxive û dema dayika wan tê ku parolayê qise bike lê dinêre ku kes tiştek jê fêm nake û ew jî tiştek ji zarokên xwe fêm nake. Paşê her kes tê li ser rûyê dinyayê, heştê zarok belavê her derê dibin û bingeha wan netewên aniha ku li ser rûyê erdê amade dikin. Paşê jî ew xortê çeleng bi melekekê re tê zewicandin û zarokên wan jî em in yanî êzidî, bingeha me jî ji vir tê. Belê Melekê Tawis ji bo me gelek girîng e lê em diayên xwe ji Xweda re dikin. Di baweriya me de melekê xirab tune ye û tu çi bikî tu pê îradeya xwe dikî, yanî tu tiştekê xêr jî bikî bi îradeya te ye an tiştek xirab jî bikî bi îradeya te ye. Em jî baweriyê bi Xwedê tînin û îbadeta xwe jê re dikin. Navê pirtûka me ya pîroz "Mishefa Reş" e, her tişt tê de bi kurdî ye, em bi zimanê xwe Xweda ra diayan dikin.

Kerem ke em herin taxa Varketîliyê, li wir Qûba Siltan Êzîd heye. Em li wir kom dibin û piştî Lalêşa Nûranî cihê herî pîroz ew der e ji bo me, ez bawer im hewceyê dîtinê ye."

Bawer im ku Memo heya sibê behsa Êzidîtiyê bikira ez jê têr ne dibûm. Ez Memo em bi hev re çûn cihê ziyareta Êzidiyan.





Reyhan Îke

# Bêhna çiya tê ji kenê we

Ku hûn dikenîn darên mazî,
Berfînên li ber keviyan
Şilêreyên latan, Nêrgizên nizaran
Sosin û beybûnên mêrgan vedibin li ser awirên me
Ku roj li guliya we dide, serbilindiya çiyayan
Derameta deştan, henaseya bayên hênik
Newaya dengê çeman di eniyên we de diteyîse ser dilê me
Ku hûn baskên xwe li Zagrosan vedikin
Keştiya azadiyê ji Cudî bi rê dixin
Qendîla hizra ronak li başûrê dilê me pêdixin
Çiya dibin taceke zêrîn li serê niştîmana me
Meydana Çarçira destên keleha Amedê digire
Helebçe destmaleke kesk, sor û zer dide destên Geliyê Zîlan û Dêrsimê
Li ber tililiyên Kobaniyê û Şengalê dîlaneke çargavî tê gerandin li ser sînga Dilberê
Û çar parçeyên welat li ser bejna we dibin yek
Hûn dibin welatê yekpare yê dilê me
Welat dibe dilên we yên dilêr û hemû evîn û hezkirin
Ciwanî û bedewî, vîn û hêvî, şanazî û şadî
Jiyan û bextewarî dibin hemwelatiyên dilên we
Hêrsa raperînan, tola birînên devbixwîn li ser devê tifingên we diteqe
Hespên Derwêşan difilitin ji beriyên kunmişkan
Edûl di fincanên ferfûrî de ken belav dikin li civatan
Keziyên Xecan digihêjin zinarên Sîpan
Bircên belek dibin çavên Zînêyan, bi awirên xwe şahên Bekoyan têk dibin
Ku navê we tê gotin, li civata hozan û zana, dengbêj û helbestvanan
Şevbêrkên rikberiya vegotina çelengî û lehengiya we dest pê dikin
Di vebêja heqîqetê de Baba Tahir, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Hecî Qadirê Koyî, Seydayê Cegerxwîn, Tîrêj, Şakiro, Kawis Axa, Cemîl Horo, Hesen Zîrek, Meryem Xan û Eyşeşan û hemû şopdarên wan giyana we maç dikin di çavên (Denîz) Deryayekê de û bi dengên xwe yên zîz û zelal pêşerojeke ronak dimeyînin di dilê giraveke dilmê de û dikin diyarî ji Dilbereke sîng deşt û gerden çiya re.



Amed Tîgrîs

# Pirs lêgerîn û encam

Di serdema me de bingehê hîndekarî û perwerdeya zanistî û nûjeniyê li ser van her sê têgehan hatine avakirin: pirs, lêgerîn û encam. Dewletên sekuler, demokrat û pêşketî, bernameyên xwe yên hîndekarî û perwerdeyê (mifredatên xwe) li gorî van têgehan amade kirine û dikin. Sîstema perwerde û hîndekariyê ji bo vê armancê ye. Mamoste li gorî vê sîstemê tên perwerdekirin. Pirtûk û materyalên hîndekarî û perwerdeyê jî her wihha li gorî vê bernameya hîndekariyê tên çapkirin û weşandin.

Gelo ev her sê têgehên efsûnî çi ne? Xwedî çi huner û çi hêz in û çi taybetiyên wan hene ku sîstema hîndekarî û perwerdeyê li ser van her sê têgehan avakirine? Belê ev metodeke aqilane û zanistî ye. Pirs, problem, girîft û dijwariyên xwezayê, kar, bûyer, mijar û dozên ne zelal, radixe ber çavan, ji bo çareserî û serastkirina wan mirov sewq û noqê hizrandinê dike. Rêya lêgerîn û lêkolînan dide pêş û mirov dixe nav lebateke piralî û piralternatîfî; ber bi dîtina bersiva pirsê ve dahf dide. Carnan mirov dikare çend xulek bi şûn ve bersiva pirsa xwe bi dest bixe û carnan jî mirov bi roj, sal û heta sed salan nikare bersiva pirsa xwe bi dest bixe. Mirov dipirse, li sedemê pirsê digere û di dawiyê de digihêje encamê. Lê dibe ku encam pozîtîf an negatîf be. Dema bersiv tê dayîn an tê dîtin êdî mijar tê girtin. Kurd dibêjin, "mirov bi pirsê diçe Qersê."

Fîlozof, fîzîknas û nivîskar Albert Einstein di vê mijarê de, bi kurtî wiha dinivîse:

"Serkeftina min ne ji zîrekbûna min e, ji vîyana min e. Heta ez negihime encamê ez dev ji pirsgirêkê bernadim."

Jixwe li cîhanê hemû îcad bi vê metoda zanistî ya pirs, lêgerîn û encamgirtinê hatine dîtin. Asta teknîk û şaristaniya îro encama berhema vê metoda zanistî ye.

Pirs, bi axaftina pitikan dest pê dike û heta dawiya temenê mirov dom dike. Piştî gixbivê pitik hêdî hêdî dest bi pirsan dikin. "Ev çi ye?.. Ev çi ye?.." Her tiştê ku dibînin dipirsin. Zarok dixwazin navê tiştên derdora xwe hîn bibin. Dê û bav divê ji pirsên zarokên xwe aciz nebin û bersivên rast bidin. Gelek dê û bav hene ku ji pirsan hêrs dibin û pirsên zarokên xwe bê bersiv dihêlin yan jî bersiva rastî nadin û zarokên xwe dixapînin. Ev helwesta dê û bav gelek xetere ye û li ser zanîn, geşedan, pêşketin û derûniya zarokan bandoreke neyînî dike û dihêle. Dê û bav divê ji pirsên zarokên xwe aciz nebin û bersivên rast û dirust bidin.

Divê mamoste dersên ku di pirtûkan de hene bi zarokan nedin jiberkirin û pêş li pirs, lêgerîn û lêkolînên zarokan negirin. Berevajî wê divê şagirdan teşwîqê pirs, lêgerîn û lêkolînan bikin. Mixabin hîn îro jî li gelek welatên paşvemayî, nijadperest û otokrat mijarên pirs, lêkolîn û li bersivgerînê bi tixûb in. Bi taybetî dewlet û civakên musilman hîn di bin sûfîzma sedsala 10'an a ku ji aliyê Îmam Xezalî ve hatiye afirandin de ne. Xezalî li dijî metoda guherbar a felsefeyê radiweste. Dibêje ev bîr û baweriyên xirîstiyan û cihuyan in. Batiniyên ku dibêjin kêmasiyê îslamê hene û divê pirs werin kirin û gotûbêj hebin, Xezalî wan kesan kafir dibîne. Xezalî li dijî guherina felsefenasan û batiniyan yekitiya dewleta Selçûkiyan a îslamî bi çar destan diparêze. Dibêje: "Dewlet pîroz e, aborî, çand, sîyaset bi giştî divê di bin kontrola dîn de bin û dîn jî ji bo yekitiya dewletê be. Her tişt û her kes ji bo dewletê ye. Pirskirin, lêkolîn, guhertin, hizirandin ehlaqê xirîstiyan û cihuyan in û guneh e. Îlahî her tiştî afirandiye û bi her tiştî dizane. Çarenûsiya her tiştê di Qalûbelayê de hatine nivîsin û guhertin ne gengaz e." Xezalî di vê mijarê de çend pirtûk nivîsandine. Ev bîrûbaweriyên Îmam Xezalî ji 1000 salî bêtir e ku di nav tevahiya dewletên musilman de bûye îdeolojiya fermî. Li van dewletan pirtûk û materyalên perwerdeyê di bin kontrola dewletê de, li ser vê îdeolojiya fermî tên amadekirin. Mamoste her wiha li gorî vê îdeolojî û bernameya dewletê tên perwerdekirin. Li van welatên otokrat Mamoste bi dil an bê dil mecbûr dimînin ku bernameya li dijî zanist û demokrasiyê pêk bînin. Mixabin Tirkiye jî yek ji van dewletên otokrat, nijadperest û oldar e. Ji dibistanên seretayî heta zanîngehan dewlet pîroz e, di mijarên civakî û sîyasî de qedexe ji bedena Amedê bilindtir, qewîtir in. Kes nikare bipirse, lê bigere, lê bikole. Kesên ku bixwazin di mijarên olî de lêkolîn bikin re dibêjin "bêdîn" û yên ku hewl bidin di mijarên gelêrî, netewî, civakî û çînî de bipirsin û lêbikolin re jî dibêjin "cudaxwaz û terorîst." Ev paşverûtî û otokratî ji tirkên selçûkî ve ji musilmanan re mîras maye.

Firçeya Şikite

Gulçîn Adar

# Vera kaosê rojeve hêzê yewbîyayîşî

Nê rojan rojeve de zaf çîyê ke ganê merdimî bidejnê estê. Merdim reaksîyonan ver nêreseno. Hetêk ra binpaykerdişê heqê tepişteyan, hetêk ra wedaritişê Pêkerdişê Stenbolî hetêk bîn ra krîzê ekonomî û ver bi ziwatîyê îklîmî. Gelo ma do senî bieşkê nê welatî de wina bi asanî helm bigîrê û bidê. Ma senî eşkenê çimê xo nê çîyan ra padê? Eke merdim xo ra vajo, "ez însan a" mimkin nêyo ke vera nînan de bêreaksîyon û bêhîs vindero.

Her çiqas medyaya Tirkan de grevê vêşanîye ca nêgîro yan zî îqtîdar nêkero rojeve xo zî la nika zîndanan de bi hezaran tepişteyî hemverê tecrîdî û binpaykerdişê heqan grevê vêşanîye de yê. Tepişteyî 225 rojî yo grevê xo dewam kenê. Roj bi roje weşîya tepişteyan kewena rewşêka krîtîk la merdim gama ke ewnîyeno komelî ra xêrcê keyeyanê tepiştey an kes nêbeno vengê înan. Hem rewşa pandemî û hem zî şert û mercê ke tede yê merdimî keno endîşe. Grev ra dima xeberê ke zîndanan ra yenê qet baş nîyê. Tedayî hîna bîyê zêde û kesê ke kewtê grev rastê muameleyê xirab yenê. Gelo ma nêeşkenê zor bidê rayaumumî û kesê ke vanê ma heqê merdiman pawenê? Eke vengêko berz semedê wayîrvejîyayîşê tepiştey an nêvejîyo, na rewşe de beno ke çîyê tewr xirab bêrê meydan. Hema ke ma zaf erey nêmendê kam beno wa bibo, kam îdeolojî beno wa bibo, eke xo sey însan bi name keno û têduştî paweno ganî bibo vengê tepiştey an.

Nê rojan de medyaya herême û Tirkîya de qalê wedaritişê Pêkerdişê Stenbolî yeno kerdene. Seke yeno zanayene hetê îqtîdarî ra 1ê temmuze de pêkerdiş ame wedaritene. Tirkîya ke bîya cayê qirkerdişê cinîyan, bi wedaritişê pêkerdişî de hîna zêde hêz dana kiştoxan. Her aşmî tewr tay 20 cinî yenê qetilkerdene. Semedê tutan, cinîyan û pêro ganeyan Pêkerdişê Stenbolî girîng bi. Coka cinîyan tewr zêde wayîr vejîyayî û astengîyan nas nêkerdî. Bi pêro hêz û têkoşînê xo ramojnayî ke pêkerdiş bêro wedaritiş zî do bêveng nêmanê û her ca de vengê xo berz bikerê. Çalakîya cinîyan roja ke semedê wedaritişî Pêkerdişî Stenbolî qal bî heta nika nêvindert. Hem serê medyaya dîjîtalî de hem kuçe û meydanan de cinîyan reaksîyonê xo ramojnayî û vatî, ma fek destkewtişanê xo ra vera nêdanê. Ma estê û ma do xoverdayîşê xo dewam bikerê.

Babetêka qet rojeve ra nêkewena û pêro welatî tesîr kerda seke yeno zaneyene ekonomî ya. Ekonomîya Tirkîya her ke şina xirab bena û nê ra zî tewr zêde feqîrî tesîr benê. Bi zamkerdişê çîyan, bacayan şaro feqîr êdî nêeşkeno keyeyê xo rê nan bero. Pandemî ke 2 serrî yo dewam keno, hem hetê psîkolojîk û hem hetê ekonomî ser komel de rijnayîş viraşt. Xeylê kesî êdî nêeşkenê debara xo bikerê, Bêpereyî û bêomîdî ra hîn kesan peynîya cuya xo ard. Yanî no kaos çend şino hîna kûr beno. Vera ke çareserî bêro vînayene caardişê ke feydeyê înan çin o yenê awankerdene. Şar êdî nê bêedaletî ra vano bes o. Bes o heqdestê tayî rê, zam û bêedaletî rê. Bes o dewlemendbîyayîşê dewlemendan ra, feqîrbîyayîşê feqîran ra. Bes o no sîstemo ke merdimî helneno ra.

Ziwatî zî nika semedê pêro dinya problemêko tewr pîl a. Xozaya ke destê însanan de ameya çinkerdene, qetilkerdene êdî êdî bedelê nê însanan rê ramojnena. Daristanê ke yenê veşnayene, darê ke yenê birnayene, awbendê ke yenê viraznayene, sîlehê ke yenê xebitnayene, kîmyasalê ke yenê rijnayene nê pêro çî dinya ver bi çinbîyayîşî benê û cuyêka nêweşe verê ma de rafînenê. Ma ganî vera nê çîyan de rêxistin bibê û kesê ke wazenê xoza lêşin bikerê, destûr nêdê înan. Her çiqas organîzekerdişê xirabî bibo zî merdim hîna zêde eşkeno bi başî xo û derûdorê xo organîze bikero. Bêrê ma pêro vera nê bêedaletî, binpaykerdişê heqan, tacîz û tecawuzan, feqîrî û ziwatî dest bidê yewbînan û vengê xo berz bikerê. Ma hêzdar ê eke ma xo ra bwer bê ma eşkenê dinya xirabî ra bivurnê başî. Ma eşkenê têduştî semedê pêro ganeyan awan bikerê. Tena çîyêk ma rê lazim o yewbîyayîşê heq û heqîqetî.



# Hîkayeya Ginar Axa û waka luye

Turabî Kîşin

Ginar axa û waka Luye pîya benê heval.

Rojê benê vêşan vanê ma se bîkîm se mekîm. Waka luye fena wa, fendê êno aqilê daye. Fendê xo Ginar Axayî rê qesî kena. Ginar axa vano "Meke ti sarê ma kena bela."

Luya to qe vindena.

Dana raye şona hetê cinawirî. Silam dana ci, cinawir cî silamê waka Luye gêno ra.

Waka luye vana "Bira cinawir to zana se bîyo?"

Cinawir vano "Se bîyo waka luye xêra mi tawa nêheşêno."

Waka luye vana "Henîyo se to pê şan û şoretê Ginar Axayî nêhesîya."

Cinawir vano "Nê waka luye, Ginar Axa kam o?"

Waka luye vana "Hêybanê de nîyanên mi ne dî ne cî heşêna. Zaf jêhatî yo. Hifzê xo pira bike. Henîke jêhatîyo firdano serê daran ra çucikan gêno. Pê jû pencikê xo binê hardî de çi esto veceno erzeno fekê xo."

Erzeno fekê xo... Cinawir terseno. O sire de heş ucayan ra derbaz beno. Qayt keno ke waka luye û cinawirî qese kerdo weş. Vano "Çi ko şima dayo têsare qesî kenê, ez cî bizanî."

Waka luye vana "Teewû Bira Heş to nêzana se bîyo."

Heş vano "Se bîyo waka luye mi ra cî vace ez cî pê bizanî."

Ez cî pê bizanî... Ana waka luye kena weş Ginar Axayî heşî rê cî qesî kena. Cinawir cî çend tenan dano ser. Heş cî zaf terseno. Xo be xo vano "No senên çî yo nîyanên o? Ma çare ke ci rê mevînîme no nê cayan ma rê keno teng."

Vanê "Ma se bikîme, se nêkîme?"

Heş vano "Waka luye baqilê ma tîya. Bê ma rê çare bivîne. Vace ma se bikîme ke Ginar Axa karşê ma nêkero?"

Waka luye vana "Eke şima zê mi kenê bîyarê pesê sare bibirnê, qelîyêde rindek de pocê, ver de cî bilxur pocê. Ez cî şorî venga Ginar Axayî bidî bêro. Eke bivîno şima cirê goşt poto kêfê xo beno weş. Aye ra dime şima de beno nas û heval endî qarşê şima nêkeno."

Qarşê şima nêkeno... Nê qewul kenê. Anê pesêde qelewe sare birnenê. Waka luye cî şona dima Ginar Axayî.

Ginar Axa û waka luye eke dotra ênê heş tersan ver ra vazdano serê jû dare de xo dano we. Cinawir cî tersan ver ra xo keno binê şakil û dar û berî.

Dar û berî... Şewa, Ginar Axa se ke dot ra êno nêzdîyê goştî, xo be xo vano "Vinde ez xo rê binê na dare de mîza xo qice û pîle bikî hîna şorî."

Se şakîlî dano ya ke mîza xo biko. O sire de cinawirê binê şakîlî terseno û xo be xo vano "Wilê Ginar Axayî ez dîya nika mi gêno parçe keno weno."

Cinawirê to qîreno û tersan ver ra şilp û remeno, xo be xo vano "Ez xo raxelesnî bira heş se keno wa biko."

Se cinawir bînê şakîlî ra zît beno cîgerê Ginar Axayî cî qutifînê arê. Zaf terseno xo cêro zîtê serê dare keno. Se xo zîtê serê dare keno, heşê serê dare xo be xo vano "Ehe wilê ez cî dîya, bira cinawir werd na defa cî dora mi ya. Heş tersan ver ra xo de sile keno. Can hawlî xo dare ra erzeno hard û remeno.

Remeno tew pê xo de qayt nêkeno.

Waka luye êna binê dare vana "Bira Ginar to qeyî nêna cêr. Bê ma xo rê goşt biwerîme."


Bê ma goşt biwerîme... Ginar Axa nêzano ci rê se bîyo. Zîbeno vano "Ez nêna. Ez ke bêrî heş û cinawir pîya mi wenê."

Waka luye vana "Nê nê ti bê, mi ê hurdînan cî fetelnayî şî. Ti bê ma xo rê goşt biwerîme."

Ginar Axa ebe ters êno cêr, şono goştê xo weno.

Oxro ke Ginar Axa jû pîsing o. Wayîrî, nameyê Ginar Axayî no piro. Ginar Axa ke beno kal endî wayîr qaytê Ginar Axayî nêkeno û gêno erzeno tewer. Ginar Axa cî şono waka luye de beno heval.

Ahenî, çîrok li dîyaran rahme li dê û bavê guhdaran...






## Rûnê simbêl

Hebû tune bû di gundê Qopê de malbatek hebû. Erê di nav vê malbatê de jî zilamek hebû. Rewş û debara vî mêrikî nebaş bû. Feqîr û hejar bû. Di nav xizaniye de bû lê belê vî mêrikî nedixwest kes bi xizaniya wî bizane û bibihîze.

Kengî derdiket derve, wî her car simbêlên xwe û dev û lêvên xwe rûn dikir. Da ku her kes dev û simbêlê wî bibîne û bibêje vî kesî savarê birûn xwariye.

Lê rojekî vî mêrikî dîsa xwest biçe derve. Li ber derî solê xwe li xwe kir û li ber derî gazind ji qîza xwe kir û qêriya: 'Keça min, ka rûnê simbêlê min bîne'. Keçika wî jî bilez rûnê simbêlê wî anî û got: 'Hilde bavo'. Bavê wê jî tiliyên xwe di nav rûn de kir, li simbêl û dev û lêvên xwe rûn kir, paşê jî çû çayxaneya gund.

Keçikê jî rûnê simbêlê bavê xwe bir û têxiste cihê wî.

Di wê navberê de, mişk pêşî, pisîk jî bi pey de direviya. Bi lez û bez derdora rûnê simbêl de çûn. Piştre bi wê bazdanê re, rûnê simbêlê mêrik kete xwarê û rijya. Keçik û jina malê ew deng bihîstin û hatin çi bibînin, jinikê got: 'Heywax! ev çi rewş e, mala me şewitî. Ka ez ê çi bibêjim mêrê xwe'.

Nalenala jinikê dom dikir û keçik jî reviya derve, çû çayxaneya gund. Li wir bavê xwe dibîne û li cem herkesî wiha dibêje: 'Bavo wele pisîkê rûnê simbêlê te xiste erdê hemû rijand. Êdî tu nikarî simbêlê xwe bi rûn bixemilînî.'

***Berhevkirin: Metîn Kewê***

## Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.




Tiştek min heye
*Di avê de pêlewane*
*Di bejayê de bê can e*

*Tiştek min heye*
*D destê zengînan de*
*Di devê feqîran d*

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
1-Masî 2-Pere

## XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3. Hest û daxwaza tolhildanê. 5.Cihê ku genim lê tê hêran. 7.Hê, Hêj. 8.Notayeke mûzîkê. 9.Bajarekî bakurê Kurdistanê. 13.Slogan, dirûşm. 14.Alaveke mûzîkê. 16. Meydan, war, wargeh. 19.Rih. 20. Reşahiya mirovan. 21. Hewar, her wiha zift. 22. Perestgeheke xiristiyanan. 25. Cînavkek di rewşa tewandî de. 26. Çêrandina pez ya bi şev. 28. Meheke havînê .

### JI JOR BER BI JÊR

1. Bajarekî rojavayê Kurdistanê.
2. Weke. 3. Ew û ceh tevlihev dibin û dibe êmê dewaran.
4. Afiyet, xweşî.
6. Bajareke Iraqê.
10. Cih.
11. Cihê ku koçer pezê xwe dibin ji bo çêrandinê. 12. Çend kes digihên hev û civatekê ava dikin.
15. Wesayîteke deryayî ji bo hilgirtina bar û rêwiyan.
17. Lazime ku, pêwîst e.
18. Namûs , rûmet.
20. Kesên bêdê û bav.
23. Alî, kenar.
24. Rengek.
27. Bersiva erênî.

Bersiva hefteya borî





Kê çi got?

Deyndar Mendo

## Tirşikçî tirşikçî ye çi nêr e çi mê ye

Di wêjeya devkî ya kurdî de tirşik bi qedir û qîmet e. Berê mîr, axa û begên kurd li ber derê palas û pêjgehên xwe tirşik li xelkên xizan belav dikirin. Wê demê hin kesên kone û şelaf ji bo çend kevçî tirşika zêde bixwin ji mîr û axa û began re şelafî, melaqî û pesindarî dikirin. Her wiha bi demê re dibûn xulamên mîr, axa û began. Bi dem û dewranê re gotina tirşikçî ket nava lîteratora kurdan a polîtîk.

Di navbera salên 80'yî û 90'î de gotina tirşikçî bi awayekî dijkolonyal êdî xwe berda nav ferhenga kurdan a polîtîk. Apociyan ji kesên ku xulamtî ji sazî û dezgehên dewletê re dikirin û bûbûn dûvikên wan re digot tirşikçî. Kesên ku ji bo memûrên dewletê digotin efendim û xwe ji efendiyan re dikirin xulam û şelafîtiyan ji wan re dikirin êdî di çavên gel de dibûn tirşikçî.

Hefteya borî M. Emîn Efe yê ji Semsûrê tirşika kapîtalîstên tirşikçî derxist û got em nikarin ji titûnê tirşikê çêbikin! Rast e heyran, ji titûnê tirşik çênabe, tirşik ji balîcan, firingî, îsot, kartol, kulind, pîvaz û hwd. çêdibe. Tirşik guneh e, lê tirşikçî tirşikçî ye û bê prensîb e. Herçî yên tirşikçî ne, çilek û boşboxaz in, tirşikçî ye, lê timî zikbirçî ye, eyarê tirşikçiyan fireh e hêjano!

Li welatê me mijara tirşikçiyan girîng e. Di her qada jiyanê de hene, lê li gorî sal û sedsalên berê teşhîr û rûreş bûne. Di nav kurdan de tenê ne di qada aboriyê de, di siyasetê de jî tirşikçî hene, ji ber ku tirşikçî ne, bi kêrî serê pîvazekê jî nayên. Her wiha tirşikçiyên wêjeyê jî hene, bêhna tirşikê bi wêjeyê xistine. Tirşikçiyên çand û huner û muzîkjeniyê jî eyb û şerma reş e.

A herî girîng hin partî û hizbên kurd ultra tirşikçî ne, dagirkerên welatê me van tirşikçiyan li ber derê palas û pêjgehên xwe digirin û wan bi tirşika xwe terbiye dikin. Bi xwedê ev axa û beg, ev şêx û meşayîxên kurd ên tirşikçî mîna jehrê ne, her diçe belav dibin. Destalêsên dagirkeran nabin dostê me kurdan.

Tirşik peyveke xaskurmancî ye û gelek peyv û biwêjên nû jê tên dariştin: tirşikçî, tirşikvan, tirşikgerî, tirşikparêz, tirşika yekî derxistin, tirşika yekî xwarin û herî dawî jî tirşikçî qapîtalîst...

Xulasa, tu kes di zikê diya xwe de nebûye tirşikçî heyran, li vê cîhana gilover û gewrik dibistana tirşikçiyan daîreyên dewletê ne. Ji ziktêrî, lê ji çavên birçî dibin ew tişt. Yanî tiştên ne tu tişt.

Dema min ev nivîs dinivîsî ji min pirsîn, gotin peyva tirşikçî nêr e yan mê ye? Min got heyra nêr be çi ye, mê be çi ye. Tirşikçî tirşikçî ye.

Wekî gotina dawî; tirşikê bixwin lê nebin tirşikçî.

Bimrin tirşikçî, bijîn welatparêz!



# Destarê wêjeyê dest bi gerandinê kir

Kovara Destar bi dirûşmeya xwe ya bingehîn 'Destarê kurdî hûr dihêre' bi tîpên latînî, bi zaravayên kurmancî, kirmanckî û soranî weşanê dike. Li hemû parçeyên Kurdistanê gelek nivîskaran bi nivîsên wêjeyî rengînî dane kovarê. Kovar 3 mehan carekê tê weşandin, hejmara ewil gihişt ber destê kurdîhezan

■ Lezgîn Akdenîz

Kovara wêjeyî ya Destar a ku bi angaşta ekoleke nû ya wêjeyî derketiye dest bi weşana xwe kir. Demeke dirêj bû amadekariyên kovarê ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve dihatin kirin. Kovara ku dê ji 3 mehan carekê bê weşandin bi hejmara xwe ya yekemîn a hezîran, tîrmeh û tebaxê gihişt ber destê kurdîhez û wêjehezan.

**Desteyên dewlemend**

Kovara Destar bi dirûşmeya xwe ya bingehîn 'Destarê kurdî hûr dihêre' bi tîpên latînî, bi zaravayên kurmancî, kirmanckî û soranî weşanê dike. Lê hewldana kovarê ew e ku di hejmarên din de cih bide zaravayên kurdî yên din jî. Kovara ku bi dehan wêjekar û nivîskarên ku li Bakur, Başûr, Rojhilat, Rojava, Ewropa, Qafqasya û her derê ku kurd lê dijîn anîne cem hev bi konsept, naverok û armanca xwe coş û kelecaneke mezin li nava kurdîhez û wêjehezan belav kiriye. Kovarê xwe bi hişmendiyeke hevpar(kolektîf) saz kiriye û dixwaze bi awayekî xwesazkirî û demdirêj weşanê bike. Li ser vê bingehê yek jê jin yek jê mêr ji aliyê du hevgerînendeyan ve tê birêvebirin. Di desteya weşanê de, di beşa kurmancî de 6, di ya kirmanckî de 1, di ya soranî de 1, tevahî 8 kes; di desteya edîtoryayê de di beşa kurmancî de 10, di ya kirmanckî de 2, di ya soranî de 2 kes tevahî 14 kes; di desteya serastkirinê de di beşa kurmancî de 8, di ya kirmanckî de 2, di ya soranî de 2, tevahî 12 kes; di desteya şêwrê de jî 60 kes cih digirin. Çend kes jî di desteya teknîkê de cih digirin. Di her desteyê de nîvê wan jin in.

**Pirtûk-kovar**

Kovara ku xwe wek 'Destara wêjeya kurdî ya xwebûnî û gerdûnî' pênase dike wek pirtûk-kovar ji 250 rûpelan pêk tê. Bergê pêşîn ê hejmara yekem ê kovarê bi nivîsa xwe ya 'Destarê kurdî bi hezaran sal e digere û dihêre û dê her û her bigere û bihêre', ku di nava xelekekê de ku 15 wêjekarên jin û 15 wêjekarên mêr ên wek stûnên dîroka wêjeya kurdî tên zanîn hatiye bicihkirin, balê dikişîne ser xwe. Di hejmara yekem de derdora 70 nivîs û helbest cih digirin.

Nivîsa pêşîn a ku li ser navê kovara Destar hatiye nivîsandin dikare wek manîfestoya kovarê bê nirxandin. Di vê nivîsê de behsa sedem û armanca weşana kovarê tê kirin, jêderk, bingeh, rêgeh û bergeha kovarê tê vegotin.

Nivîsên di kovarê de, di nava çend beşên ku li gor naverok û mijarên bingehîn hatine dabeşkirin de hatine bicihkirin. Beşên wek, Destarê Raman, Nirxandin û Lêkolînên Wêjeyî (Wêjeramangeh), Destarê Rexneya Wêjeyî, Destarê Wêjeya Devkî, Destarê Çîrokê, Destarê Ceribandinê, Destarê Bîranînê, Destarê Helbestê, Destarê Kovargeriya Kurdî, Destargerên Wêjeya Kurdî, Destarê Wêjeya Cîhanê, Destarê Wergerê, Destarê Kirmanckî, Destarê Soranî derketine pêş.

**Wêjeya xwebûnî û gerdûnî**

Di nivîsa ku li ser sedem û armancên derketina kovarê hatiye nivîsandin wiha tê gotin: "Me kurdan li jîngeheke sereke û bingehîn a mirovahiyê Kurdistanê, li gel gelek destaran destarê ziman û wêjeyê kurdî jî -çi bi devkî be, çi bi nivîskî be- gerandiye. Li gel hemû êrîş, zordestî, serdestî, dagirkerî, mêtingerî û komkujiyên cûr bi cûr ên herî dijwar û hovane yên li ser kurdî û Kurdistanê, bi saya ked, xwehdan û xwîna bi sed hezaran destargerên cangorî, xwebexş û jiyanbexşên nemir ew destar tu car nesekiniye. Niha jî di pêşengîtiya destargerên azadîparêz ên Kurdistan û mirovahiyê de, wek destarekî xwebûnî/kurdewar û gerdûnî, ji her milî ve û li her qadê digere û heta hilm û henaseya kurdî û Kurdistanê hebe jî dê bigere, dê ziman û wêjeya kurdî bihêre."

**Serhildan û raperîna wêjeyê**

Kovara Destar diyar dike ku dê li dijî hişmendiya wêjeyî ya şarsitaniya navendî ya desthilatdar û modernîteya kapîtalîst û êrîşên piralî yên li ser ziman û wêjeya kurdî, hewl bide ku bibe kovareke wêjeya modernîteya demokratîk a gerdûnî û neteweya demokratîk a kurdewar. Bi vê mijarê ve têkildar wiha hatiye gotin: "Di sedsala bîst û yekê ya ku em tê de dijîn jî neteweya kurd, li ser hîm, bingeh û rasteqîniya xwe, ji bo parastina hebûn, xwebûn û hemû nirxên xwe yên kurdewar, li dijî her cûreyê dagirkerî, zordestî, desthilatdarî, mêtingerî, kedxwarî, êriş û 'kujî'yên hemû hêmanên moderniteya kapîtalîst û hêzên serdest ên tunehesibîner, bişafker, helîner û jiholêraker ên ku hêz û çavkaniya xwe ji her cureyê paşverûtî û hovîtiyên şaristaniya navendî ya desthilatdar, yekdest û xweperest digirin, li ser hîm û bingeha bîr, hiş û giyanê pergalramana şaristaniya/modernîteya demokratîk li ber xwe dide. Bêşik û guman, qadeke sereke û jêneger a vê berxwedanê qada ziman û wêjeya kurdî ye. Destarê kurdî, dê hewl bide ku ziman û wêjeya kurdî li ser vê bingehê û bi destikekî wiha fireh bigerîne û hûr bihêre. Destarê kurdî li ser bingeha parastin û pêşxistina kurdî nav û nîşana berxwedan, serhildan û raperîna wêjeyî ya xwebûnî û gerdûnî ye. Rêgeh, rûgeh, bergeh û asogeha Destarê kurdî xwebûneke gerdûnî û gerdûnîbûneke xwebûnî ye. Li ser vê bingehê hevgir û tevgir e."




**Çavkaniya yekitî û xebatên nû**

Kovara Destar a ku li bin sîwana Enstîtuya kurdî derdikeve û gelek sazî û nivîskarên kurd ên li her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê anîne cem hev û wek mizgîniya xebatên nû jî xwe dide der. Di vê mijarê de jî wiha hatiye gotin: "Kî dizane, dibe ku ev DESTAR hind fireh bigere û hûr bihêre di pêşerojê de destarê weşanxane, dibistan û akademiyeke ziman û wêjeya kurdî jî bigerîne; heta, bi riya hilberîn û xebatên ronakbîrî/entelektuelî yên hemû pêkhateyên xwe yên herî tevgir û hevgir bibe bingeh û çavkaniyeke sereke ya yekîtiya neteweya kurd a azad û demokratîk. Bo çi nebe!"

**"Dema dema wêjeya kurdî ye"**

Her wiha ji bo serkeftineke domdar û encamgir a kovarê bang û gazî li nivîskar, kurdîhez, wêjehez û hemû kurdan tê kirin û wiha tê gotin: "Bawerî, hêvî û bendewariya me ew e ku her kurdeke/î kurdîhez û wêjehez, azadîhez; çi bi nivîsên xwe, çi bi xwendinê, çi bi rexne, nirxandin û pêşniyarên xwe, çi jî bi awayên din dê destikê destarê xwe bigire, bigerîne û bibe destarger. Em ê bi hev re bibin destarger û destarhêrên xwe.

Divê em baş bizanin ku, serkeftina firehgerandin û hûrhêrandina Destarê wêjeya kurdî, çi nivîskar/helbestkar/wêjekar, çi xwendevan, çi kurdîhez/wêjehez di destê me hemûyan de ye. Dîrok û çîroka me, dil, hiş, giyan,şiyan û jiyana me, hêz û çavkaniya têkoşîna me ya xwebûn-î-parêz û gerdûn-î-parêz, wek wan rojên pêşîn ên dîrokê yên destpêka civakbûyîna mirovahiyê têrê dike ku weke her qadê di qada wêjeyê de jî em bibin pêşeng û çavkaniya mirovahiyê. Êdî dema vê yekê hatiye. Dem dema gerandin û hêrandina wêjeya kurdî ya xwebûnî û gerdûnî ye."

# Hunermend Civan Gasparyan û dûdûk

■ Bêrîvan Kayi

Dûdûk enstrûmaneke qedîm e û xwedî dengekî efsûnî ye. Di dengê bilûr, dûdûk, ney û meyê de çîrokên Mezopotamyayê bêhna dîroka qedîm a çanda Mezopotamyayê heye. Bingeha dîroka vê enstrûmanê wek a bilûrê xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Dûdûk enstrûmeneke çanda ermenan e. Ji dara mişmişê ya ku li ber tavê hişk bûye, tê çêkirin.

Mirovahiyê cara yekem hest û baweriya xwe bi enstrûmanên wek bilûr, dahol, erbane, dûdûk aniye ziman. Ertan Tekîn ji bo vê yekê wiha dibêje: "Dûdûk û mey ji bo gelên Mezopotamyayê, Anatolya û bi taybetî yên Rojhilata Navîn bûye dengê erdnigariyê. Her çiqas ku niha di gelek zanîngehên Tirkiyeyê yên beşa Konservatuarê de enstrûmanên ermenî û kurdan bi tu awayî li ser navên wan neyê binavkirin jî, rastiya van enstrûmanan berbiçav in. Dûdûk enstrûmana ermeniyan a pîroz e ku navê 'Tzirana Poğ' lê dikin; mey jî wek 'meya kurdan' tê pênasekirin."

**Efsaneya dûdûkê**

Ka bi pênaseya Sûren Aseduryan em li çîroka dûdûk mêze bikin: "Li gorî efsaneyekî, piştî tofanê keştiya qewmê pêxember Nuh xwe li serê çiyayê Agirî daniye û tovê mirovahiyê carek din ji vir belav bûye. Bi destpêkirina çîroka mirovahiyê, di heman rojê de bikaranîna dûdûkê jî dest pê dike. Ji wê rojê û vir ve gelek kesan li dûdûkê xistine lê belê yên ku ji heqê wê derketine pir hindik in..."



**Hostayê xwe matmayî dihêle**

Kesên ku heqê dûdûkê, bilûrê, meyê dide bi rastî jî êdî pir hindik in. Yek ji van vîrtozê dûdûkê jî Civan Gasparyan e ku di 6'ê tîrmeha 2021'ê de çû ser dilovaniya Xwedê. Di zarokatiya wî de li salonên sînemayê fîlmên bêdeng bi muzîkên gelêrî dihatin nîşandan û Gasparyan cara yekem dûdûkê di fîlmekî de guhdar dike, bala wî dikişîne. Jê re dibe meraq û dikeve pey şopa vê enstrûmanê. Di 6 saliya xwe de ji ber xwe hînî lêdana dûdûkê dibe. Piştî re di sala 1943'an de ji Markar Markaryan (hostayekî dûdûkê) daxwaza dûdûkekî dike. Markaryan ji ber temenê wî yê biçûk henekê xwe pê dike lê hember israr û xwesteka Gasparyan jî bêçare dimîne, dûdûkekî dide. Gasparyan di nava 6 mehan de bi şev û roj li vê enstrûmanê dixe û dawiya dawî bi awayekî ku hostayê dûdûkê Markaryan jî bi terzê xwe matmayî dihêle. Êdî rêwîtiya wî ya bi vê enstrûmanê re dest pê dike.

Civan Gasparyan li Moskovayê tev li pêşbirkeke navneteweyî ya enstrûmanên pifkirinê dibe. Ew cara yekem bi straneke Gomîdas derdikeve ser dikê. Kesên ku hatine salona konserê û yên tev li vê pêşbirkê bûne cara yekem dûdûkê dibînin û dibihîzin. Gasparyan di wê pêşbirkê de bi ser dikeve û her diçe bi hunermend û stranbêjên navneteweyî re tê gel hev. Helbet ji zarokatiya xwe ve ji aliyekî ve dixebitî li malbata xwe mêze dikir, li aliyê din jî bi her du destên xwe û dilê xwe bi enstrûmana xwe girtibû. Gasparyan bi vê pêşbirkê êdî hem derdikeve ser dikê hem jî li dawetên Ermenistanê li dûdûkê dixe û her wiha di warê aboriyê de alîkariya malbata xwe dike.

**Li ser dikên cîhanê**

Vîrtozê dûdûkê Civan Gasparyan ji salên 1956'an heta 1988'an li gelek deverên cîhanê digere, li ser dikên binavûdeng konseran dide û bi terzê xwe û enstrûmana xwe tê nasîn. Yanî êdî tenê ne li ser dika Azerbeycan – Ermenistanê li gelek deverên cîhanê bi albûmên xwe tê nasîn.

**Fîlmê Gladyator**

Gasparyan êdî bi muzîkên xwe yên ku çanda ermeniyan li gelek deverên cîhanê belav dike, tê nasîn. Bi orkestrayên senfoniyê yên herî popûler, bi muzîkjenên wek Peter Gabriel, Lionel Ritchie, Michael Brook û hwd. re dest bi xebatên xwe dike. Li Amerîka û Ewropayê gelek albûmên xwe çêkirin. Ji fîlmên bi navê 'Ronin' heta 'Gladyator' muzîkên wan çê kirin. Gasparyan ji 6 saliya xwe heta 95 saliya xwe kedeke mezin daye huner û çanda gelê xwe û çanda Mezopotamyayê.

# xwebûn

12-18 Tîrmeh 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 82

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** Elif Can Alkan
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85


# Paletî bi zibareyê xweş e

## Ji nav erdên bê ser û ber rengekî zer dibiriqe. Tîna rojê di rayên simbilekê de tevdigere û roj tê li ser sifreya welatiyan dibe nanê tenûrê an jî xwarinên cur bi cur… Simbilên genim ên çend demsalan ji axa welêt hildiberin, bi serbilindiyekê li benda paleyan in

**Serdar Altan**



Li xwezaya her welatekî berhemên cûr bi cûr şîn dibin, li her welatekî bi rengekî cuda dibişire xwezaya dewlemend. Ji ber vê yekê ye ku li her welatekî fêkî û nebatên cuda hene. Lê hin berhemên xwezayê hene ku li gelek welatan tên çandin û şêwaza çandiniyê û berhevkirinê ji hev diguherin. Şêwazên cuda li welatan dibin çand û kevneşopî û bi vê yekê li derdorê deng vedidin.

Çandiniya genim jî yek ji wan çand û kevneşopiyan e ku li Kurdistanê bi çandinî û berhevkirina xwe bûye rengekî welat. Paleyên welêt bi hevkarî û kêş û coşa berhevkirina simbilên genim bûne taybetiyeke Kurdistanê. Ji serdema Neolîtîkê heta roja me genim her tim bûye pêdivî û jiyana mirovahiyê. Û her ji wan erdan zêde bûye û li cîhanê belav bûye.

Erdê ku havînan hatiye gêsinkirin û heta payîzê vala maye ango bêhna xwe vedaye, di mehên payîzê de tê çandin. Welatî pêşmalkekê li ber xwe girê didin û hundirê wê tije tovê genim an jî ceh dikin. Her carekê kulmên xwe tije dikin û bi ser erda dewlemend de direşînin.

Bêhna xwezayê fireh e, heta ku wexta zîldanê neyê lez nake. Roj bi roj, hêdî hêdî, li benda biharê dimîne ji bo rengekî newaze. Di dawiya zivistanê de êdî xweza xêrhatina biharê dike û her cureyên rengê xwezaya Kurdistanê dixemilîne.

Genim gihayekî wisa ye ku bi barana biharê tê avdan. Di dawiya biharê de bejna genim dirêj dibe, rengê kesk hêdî hêdî cihê xwe ji zerekî henûn re dihêle. Bi bayê biharê hundirê simbilan tije dibe û serê wan hêdî hêdî ditewe. Vaye dema dirûnê hatiye.

Bi germa havînê re demsala komkirina simbilên genim ango demsala paleyan dest pê dike. Ya rast çinîna genim ji bo paleyan ne wekî karekî ye. Helbet ev nayê wê wateyê ku ev kar ne karekî zehmet e. Lê belê di dirûnê de coşa welatiyan, civat û stranên ku di ber çinînê re dibêjin, dirûna genim vediguherînin şahiyekê.

Wexta ku welatî behsa paletiyê dikin wekî çandekê û kevneşopiyekê şîrove dikin. Ev ne gotineke ji rêzê û binê wê vala ye. Di kevneşopiya dirûna genim de hevkariyeke cîran, gundî û hogiran heye. Bi gotineke din civakê digihîne hev, mirovan ji tenêtiyê xelas dike. Her wiha karekî ku bi rojan bidome bi vî awayî di demeke kintir de diqede. Ev hevkariya ha bi gotina "zibare"yê tê binavkirin. Dem hatiye, wê welatî zibareya hev bikin.

Em li herêma Botan in. Ev der zeviyên genim yên aliyê Şirnexê ne. Kevneşopiya zibareyê li vê herêmê hê jî zindî ye. Ji ber ku li vê herêmê zeviyên fireh û mezin tune ne û erda ku lê çandinî kirine ne ew cih e ku makîneya dirûnê bikeve nav, kar dikeve ser milan. Welatî her sal bi hevkarî dexlên xwe didirûn. Çend malbat her roj digihîjin hev û bi dorê genimê xwe didirûn. Bi vî awayî ne dexlê kesî li erdê dimîne, ne jî xwediyên zeviya zêde reht dibin. Bi gotineke din welatî mil didin milê hev û karê xwe bi hevkarî ji holê radikin.

Di dirûna genim de pale bi yekrêzî bi hev re naxebitin. Ber bi aliyê paş ve nîvkevanekê çêdikin. Bi vî awayî nahêlin di nava erd de genim bimîne. Ji ber ku heke kesên pêş hin simbilan li paş xwe bihêlin jî paleyên li pişte yên ji ber yê pêşiyê mayî diçinin.

Di destekî paleyan de dasûk heye, bi destê din jî qevdek simbilên genim digirin û bi awayekî rîtmîk, bi hev re genimên xwe diçinin. Jixwe ya balkêş ew e ku piranî bi hev re ditewin û simbilan dibirin. Dibe ku ev yek bûbe sedem ku li gor tevgerên wan ên çinînê hin stran hatibin afirandin an jî dibe ku li gor rîtma stranan ditewin û diçinin. Ji ber vê yekê dengbêjî di karê paletiyê de cihekî girîng digire.

Her çiqas paletî li ber dilê welatiyan şêrîn be û ji vê yekê kêfê bigirin jî di rastiyê de karekî zehmet e. Hêzeke baş jê re divê. Lê ji bo ku welatî ji vê kevneşopiya pir hez dikin carinan bi hev re dikevin nav qayişkêşanê û ji hev re dibêjin ka em biceribînin kî dikare bêhtir berdewam bike.

Genimên ku ji dexlan hatine birîn bi qasî çend rojekê di nav erdan de dimînin. Piştî çend rojekê ku li ber rojê hişk dibe êdî ji nav erdan radikin. Pêvajoya neqandina simbilan û pêvajoyên din dest pê dikin.

Feydeyên çandiniya genim ne tenê li mirovan dibe. Piştî ku simbilên genim tên birîn pûşê wan dimîne. Bi hêrandina wan pûşan ka derdikeve holê. Bi vî awayî welatî zadê zivistanê yên sewalên xwe bi dest dixin.

Zemanên berê hema bêjin li tevahiya Kurdistanê genim bi vê şêwazê dihate dirûn. Di salên dawî de bi pêşketina teknolojiyê mekîneyên dirûnê vê karê dimeşînin. Ji ber wê li welêt li kêm deveran mirov dirûna bi vî rengî dibîne. Lê belê herêma Şirnexê hê jî dev ji vê kevneşopiyê bernedane. Welatiyên şirnexî da ku ev kevneşopî berdewam bike bi zanebûn her sal tên gel hev û bi hev re dexlên xwe didirûn.

Dengek tê ji dûr. Dengekî biêş, li ba dike hemû simbilan, dihejîne hemû pelan û konê xwe vedide li ser dilan. Ji nav zeviyan dengbêjek diqîre, dibe bayekî hênik ê berêvarên havînê. Fireh dike bêhna paleyên welêt û dibe sebra dilê welatiyan.

Bi pale û zibareyê, xweza dîsa tev li jiyana Kurdistaniyan bûye û bi rengekî cuda hem li ser sifreya wan û hem jî di nava çanda wan de cih girtiye. Ji Neolîtîkê heta roja me ev çand bûye jiyanek ji bo welatê me. Û her wiha bûye rengekî welat û silavek germ dide ji bo pêşerojê.

# Demên berê patoz jî hebûn

**Navenda Nûçeyan**



Heta 20 sal berê di van mehan de bênder dihatin hûrkirin. Lê niha bi pêşketina teknolojiyê bênder û karê patozan bûye dîrok.

Patoz amûra ku pûş û kewşê ceh, genim, nîsk, nok û pincarên din dihêre û dike ka. Berê cercere/gêre hebûn. Cotkar û rêncberan piştî paletiya genim, ceh û nîskan berhemên xwe tevî pûş û kelaşên wan ji nava zeviyan kom dikir û li pêşiya gund an jî pişt gund bendêr çêdikirin. Pûş û kewş çend rojan li ber tavê di bêndêrê de diman. Piştî çend rojan cercere/gêre davêtin pişt hesp û keran û bênder hûr dikirin. Pûş û kewş dikirin ka.



Lê her ku teknolojî pêş ket, kar hêsan bû, karê meheke daket hefteyekî û niha karê meheke di rojekê de tê kirin. Piştî karê cercerê/gêreyê û patozê, niha bîçer hemû karan bi hev re dikin. Hem diçinin, hem dihêrin û hem jî kayê dixin romork-qaseyan û li kadînê vala dikin. Hemû karên berê bi zibare û tifaqê dihatin kirin. Lê piştî teknolojî pêş ket, hevkarî, tevkarî û parvekirin jî qut bû. Betalî pêş ket.

Patoz di dawiya sedsala 20'î de pêş ket. Li her gundekî dewsa bênderan hebû. Hemû gundiyan di demsala havînê de piştî paletiya ceh, genim û nîskan dikirin, berhemên xwe yên diçinîn li şûna bênderan kom dikirin. Bênder çêdikirin. Piştre hemû ciwanên gund bi hev re bi awayekî tifaq û zibareyê bênder bi patozê hûr dikirin. Bi tifaqî ka dikişandin kadînan. Ji ber kar di demsala havînan de dihat kirin, betir karên hûrkirina bênderan û karê patozê, di saetên êvar, şev û sibehan de dihat kirin. Hemû ciwan li hev kom dibûn û rojê bêndera malekê diavêtin patozê. Rojê kaya malbatekê dikişandin kadînê. Rojê cêza nîsk û genimê malekê dikişandin, risl/depoyê. Bi hevr e stran digotin. Bi hev re xwarin dixwarin. Bi hev re kar dikirin. Her karek zimanek û çandek bû.

Di wê kelekela havînê de paletî zehmet bû, lê axir debara jiyanê bi xwe bû. Patozên ku salê sê demsalan radizan, zeng digirtin, di mehên havînê de dibûn pizotên hesinî. Şev û roj gurmegurm bi wan diket, maliyan bi jinezaran ve serdana patozan dikirin. Patozên rengo rengo wekî xewnekê di berê de man.

Her karek hevkarî û şahiyek bû. Her karek parvekirin û hezkirinek bû. Kedek mezin dixwest. Lê jiyanek komîn û hevpar bû. Niha teknolojî pêş ketiye. Her tişt hêsantir bûye, lê cîran ji cîran, mirov ji mirov dûr ketiye. Mirov ji çand, ziman, ked û hilberînê dûr ketiye.